# Bûye sembola şerê Vîetnamê

Kîm Phuc ew keçika vîetnamî ya ku ji ber bombeyên napalmê yên Amerîkayê direviya ye. Û reva wê ya li ber deklanşora fotokêş Nick Ut bûye sembola zilma Amarîkayê ya li Vîetnamê. Mîrov bêje, 'sembola wehşeta li hemberî vîetnamiyan hatiye meşandin e', gotin di cih de ye. Û di heman demê de bûye sedem ku zilmkar ji zilma xwe fêdî bikin... *RÛPEL - 7*






# Çiyayê Cûdiyê dê bi hunerê bixemile

Şaredariya Silopiyê, 3'yemîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Silopiyê dê di navbera 30'yê nîsanê û 2'yê gulanê de li dar dixe. Di mîhrîcana ku dê bi slogana "Aştî dê bi hunerê bê Cûdiyê" pêk tê de, dê li ser mijarên jin û aştiyê bê sekinîn û bernameyên wekî şano, pêşengeh, konser, panel, hevpeyvîn û çalakiyên hunerê yên din dê bên pêşkeşkirin. Şaredarê Silopiyê Emîn Togrul der barê mîhrîcanê de agahî da û diyar kir dê li ser Çiyayê Cûdiyê, li ser axa pîroz mîhrîcanê pîroz bikin û ji hemû herêmê re banga tevlîbûnê kir. Bernameya mîhrîcanê gelekî dewlemend e ... *RÛPEL - 9*


# ROJEV

29 Nîsan - Pêncşem 2010 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 kr Hejmar: 30


## Jin yekitiyê ferz dikin

1'emîn Konferansa Neteweyî ya Jinan li Amedê pêk hat. Ev gelek girîng bû ku yekitî û konferanseke neteweyî di şexsiyeta jinan de pêk bê. Jin her tim ji bo civak û yekitiyê dixebitin. Ne tesaduf e ku civakîbûna yekemîn ji aliyê jinan ve hatiye avakirin. Jin her tim pirsgirêkan tune dike û ji bo yekitiyê dixebite...

Mistefa AVAREŞ R.2

## Kul û êşên gel distra



Li nava kurdên ku li Yekitiya Sowyetan a kevin dijiyan, dengbêja jin a pêşîn, hunermenda jin a pêşîn, Sûsika Simo ye. Ji ber ku Sûsika Simo dengbêja me ya jin e, ku di sala 1946'an de, li ser navê gelê kurd cara pêşîn derket ser dikê û kilamên bi kurdî got... *RÛPEL - 9*



## Ji bo hin hevdîtinan diçin DYA'yê

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û hevserokê DTP'a ku hatiye girtin Ahmet Turk dê 2'yê gulanê de ji bo hin hevdîtinan biçin Amerîkayê û cîgira hevseroka BDP'ê Emîne Ayna jî di nav heyetê de cih digire... R5

### LI SER SÎNOR LIV Û TEVGERA LEŞKERÎ ZÊDE DIBE

# Şer li ber derî ye

Li seranserî sînorê Îran û Iraqê ku ji nêzî 250 kîlometreyî pêk tê mewziyên leşkeran têne avakirin û qereqolên nû yên seyar têne avakirin. Ev yek jî îhtimala şerekî nû li ber derî ye zêde dike. Ji bo şer mezintir nebe û rê li pêşiyê bê girtin BDP di nava hewldanan de ye

### LIGEL QEREQOLÊN HEYÎ QEREQOLÊN SEYAR

Li ser sînor ligel qereqolên heyî qereqolên nû têne avakirin. Li sînorê Îranê ligel tabûrên Qasren, Kotol, Şitazn, Ramuda û Tabûra Sînor a Oremarê û qereqolên Kokep, Qereqola Cendermeyan a Bajirgehê, Şahê, Wargenim, Aytepe, Kamber, Aylava, Sineva, Serdeşt, Sêrengol û Qereqola Girê Gulordê qereqolên seyar tên avakirin.

### TUGAYA BOLUYÊ LI HERÊMÊ TÊ BICIHKIRIN

Li sînorê Çelê û Iraqê heta niha li seranserî sînor qereqol hatine avakirin. Li gel van qereqol û tabûran Berêreş, Kurkî, Deştan Zêryê, Darsînkî, Eriş, Gire Geryayî, Bilêcan, Morikî û Zîyaniş, Qupî dîsa gelek qereqolên nû hatin avakirin. Yekîneyên Fermandariya Tûgaya Bolu ya Kayseriyê jî dîsa li herêmê hatin bicihkirin. *RÛPEL - 3*

### JI BO ÇALAKIYA MERTALÊN ZINDÎ BERNAME

Serokên bajêr ên BDP'î ji bo ku operasyon û peşveçûnên dawî binirxînin li Enqereyê li navenda giştî ya BDP'ê civînek li dar xistin. Di civînê de mijarên wekî operasyon, mertalên zindî, guhertina makezagonê hate nîqaşkirin. Her wiha di civîna serokên bajêr ên BDP'ê de, der barê mijara mertalên zindî de bername tê derxistin... *RÛPEL - 5*




## Li ser sînor yekîneyên tangan têne bicihkirin

*Li ser sînor sewqiyateke leşkerî ya mezin heye. Ligel qereqolên seyar ên têne avakirin, li herêma Besta, çiyayê Cûdî û Kela Memê operasyon kete roja çaremîn û her wiha li ser sînor yekîneyên tangan têne bicihkirin.*

## Operasyonan rawestînin

Li Kurdistanê operasyonên leşkerî her diçin zêde dibin. Serok û rêveberên partiyên EMEP, ODP û SDP'ê li diji operasyonên tên meşandin nerînên xwe anîn ziman û xwestin di demek nêzîk de dawî li operasyonan bê... *RÛPEL - 5*

**JIN:**

## Divê tifaqa jinan bê xurtkirin

Beşdara Konferansa Neteweyî ya Jinan li Amedê derhênera rojhilatî Şîrîn Cîhanî, diyar kir ku lazim e organîzasyonên jinên kurd bên cem hev û yekitiya xwe bi awayekî xurt bikin... R7



**DOSYA:**

## Rewşa girtiyên nexweş

Li Tirkiyeyê, li gel hemû bang û nezarîbûnên têkildarî rewşa girtiyên nexweş, bêdengiya rayedarên hikûmetê ya li hemberî van girtiyan didome û dem bi dem dibe sedema mirinên nû. Her kesê ku rojev û siyaseta Tirkiyeyê dişopîne baş dizane ku sedema girtina şaredar û siyasetmedarên kurd... R8

## Şarê dormeyê liseyî aciz bîyê

Problemanê herî gird êy dibistanan û yên civakî ra tiryaka ke wendoxan mîyan de yo. No problem lîseyan de tikey kesan mîyan de bi balî û esrar ontişî eyseno. Qeza Amedî Erxenî Lîseya Suleyman Nazîfî de gora niştecayanê dormeyî vanêy, wendoxanê ke teberê lîseyî de danê jûbînî ro û jûbînî teşwîkê tiryakî kenê ra, zaf eciz bîyê. Qabê ke no problem çareser bibo yaberdoxan ra alîkarey wazenêy... *RÛPEL - 11*

# 'Civak bi rizînê re rû bi rû ye'




Bûyerên li Sêrtê rewşa civaka kurd ku hêzên dagirker civaka ku dixwazin biafirîne nîşan dide. Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk Yuksel Genç ji bo bûyera tecawizê ya Sêrtê anî ziman ku bi rizandina civakê re rû bi rû ne. Prof. Dr. Nukhet Sirman nerazîbûn nîşanî gotinên hikûmetê da û diyar kir ku hewldana hikûmetê ya veşartina bûyerê ji tirsa windakirina erk û hakimiyetê diqewime... *RÛPEL - 4*

www.arsivakurd.org

# Jin yekitiyê ferz dikin

MISTEFA AVAREŞ

1'emîn Konferansa Neteweyî ya Jinan li Amedê pêk hat. Ev gelek girîng bû ku yekitî û konferanseke neteweyî di şexsiyeta jinan de pêk bê.

Jin her tim ji bo civak û yekitiyê dixebitin. Ne tesaduf e ku civakîbûna yekemîn ji aliyê jinan ve hatiye avakirin. Jin her tim pirsgirêkan tune dike û ji bo yekitiyê dixebite. Jiyana malbatê jî mînaka şênbertirîn a vê yekê ye.

Dîsa ji vê parçebûna kurdan jî zirara mezintirîn gihîştiye jinan. Dema ku yekitiya kurdan tune dibe, mêtînger wêrek dibin. Jixwe yek ji sedema neçareserkirina pirsgirêka kurd jî ev e. Heke ku kurd bûbûna yek, dê ev mêtîngerî bi dawî bibûna. Bi vê yekê jî dê pirsgirêka kurd bihata çareserkirin.

Jina kurd, sembola êşên gelê kurd e. Jina kurd êdî naxwaze ku êşan bikşîne. Ji ber vê yekê jî yekitiya kurdan dixwaze. Ew bixwe yekitiyê ava dike û bi vê yekê jî yekitiyê li hêzên siyasî yên kurd ferz dike. Bêguman pevçûneke di navbera sazî û rêxistinên kurdan de naxwaze. Lê ev jin vê yekê baş pêk naynin. Yekitiya siyasî ya kurdan dixwaze. Divê hemû rêxistin li dijî vê banga jinan cidî nêzîk bibe. Ew kesên ku hestên jinan fêm nakin û bi cih naynin, civaka kurd jî fêm nakin.

Dîsa pir watedar e ku jinên kurd li keleha demokrasiya kurd, li Amedê dicivin. Çimkî jin, amûra mezin a ku demokrasiyê mezintir û berfirehtir dike ye. Dîsa di nav bajarên din ên Kurdistanê de jî karakterê têkoşîna demokrasiyê zêdetir li Amedê heye. Jixwe sedema ku em ji Amedê re dibêjin Keleha Demokrasiya Kurd jî, ev e.

Jina kurd, heta çend sal berê jî nikaribû ji deriyê mala xwe derkeve. Lê îro em dinêrin, hemû sînorên fizîkî tarûmar dike û li paytexta Kurdistanê dicive.

Heke ew jina ku heta çend sal berê jî nikaribû ji mala xwe derkeve, îro hemû sînoran tarûmar dike û dicive, ev sedema şoreşeke civakî ye. Heke ku jina kurd dibe pêşenga yekitiya neteweyî, ev jî di encama bi peşketina jina kurd e. Hat dîtin ku tiştên siyasetmedarên mêr pêk naynin, jinên kurd pêk tînin.

Jinên kurd nîşan dan ku ew bi tu awayî şerekî di nav kurdan de naxwazin. Ev helwest, di heman demê de ji hêzên başûrê Kurdistanê yên ku Tirkiye dixwaze wan jî bixe nav şerê li dijî Tevgera Azadiya Kurd, bersivek e. Em wiha difikirin ku jinên PDK û YNK'î vê bersivê girtine. Dîsa hatiye fêmkirin ku hêzên Başûr heke tiştek bi vî rengî bikin, dê ber her tiştî jin bersivê bidine wan.

Nûnerên gerîlayên jin tevlî vê konferansê nebûne. Dîsa jinên kurd ên hatine mişextîkirin jî bi awayeke baş tevlî nebûne. Ji rojhilat û başûrê rojhilat a Kurdistanê jî nûnerên baş nehatine. Lê ev tê zanîn ku ruh û giyana gerîlayên jin di nav konferansê de xwe daye hîskirin. Qet nebe, derketiye holê ku azadî û demokrasî bi têkoşîneke mezin tê bidestxistin.

Di pêkhatina konferanseke bi vî rengî de, roleke mezin a berxwedana jinan heye. Li bakurê welat, bi hezaran lehengên wekî Xanim Yaverkaya, Bêrîvan, Rahşan, Zekiye, Ronahî, Bêrîtan, Azîme, Zîlan, Gulbihar, Sorxwîn û Nûdayan hene. Li, başûrê rojava bi sedan fedaiyên wekî Şîlan û Dîcleyan hene. Li başûrê welat jî milîtanên mezin ên wekî Leyla Qasim û Viyan Soran hene. Dîsa li rojhilata welat jî di şexsiyeta Zîlan Pepûle de berxwedaneke jinê derketiye holê. Roja jina kurd a di serhildanê de jî tê zanîn.

Wekî ku dixuye, ev ne tesaduf e ku jinên kurd bûne pêşengên yekitiya neteweyî. Dîsa konferanseke bi vî rengî jî destê hin kesên din pêk nehatiye. Jinên kurd niha bûne pêşengên yekitiyê û vê yekê jî di encama hişmendiyeke mezin a ji dîrokê herikiye bidestxistine.

Ji ber vê yekê jî ev konferans dê bandoreke mezin bide jiyana civakî û siyasî ya gelê kurd. Ev konferans dê bibe sembola xebat û têkoşîna neteweyî. Ev konferans dê ji niha û pê ve zêdetir bê rojevê.

Êdî tu polîtîkayeke ku jina kurd nas neke û xwestekên wê bi cih neyne, dê bi ser nekeve. Çimkî îro jina kurd di her qada jiyanê de xwedî roj û mîsyonek e. Jina kurd niha hêza pêşengiyê ya jiyana civakî, siyasî û çandî ya gelê kurd bi dest xistiye. Di parastina rewa ya gel de jî li gel mêr şer dike. Bi mêr re têdikoşe. Ji ber vê yekê jî heke ku jina kurd yekitiya neteweyî dixwaze, konferanseke neteweyî dixwaze, divê her kes li wan guhdarî bike.

Hemû hêzên siyasî yên kurd jî mecbûr in ku bi rêzdarî nêzîkê ramana jinan bibe. Hemû saziyên ku vê yekê nekin, dê bi xezaba xwedê re rû bi rû bimînin.

Bi hêviya ku dê ev xebata yekitiya neteweyî ya li Amedê hat destpêkirin, bi konferanseke neteweyî bigihîje encamê.



# Cerdevan an cehş kî ne?

Di hemû olan de mirovên herî kirêt mirovên ku li dijî qewmê xwe tevdigerin. Gelo dema ku mirov li hemberî zarokên xwe yan jî ferdek ê malbata xwe çekê bi kar bîne. Wê demê ew bi kîjan rûyî xwe mirov dihesibîne

ZEHRA TÜNÇ

Cerdevan an jî Cehş ji bo kesên ku bi dewletê re kar dikin û li dijî serhildêran şer dikin, tê gotin. Her wiha ji kerên çelik re jî Cahş tê gotin.

Di jiyana mirovan de tiştê herî kirêt ku mirov li hemberî Xwedayê xwe û hem jî li hemberî miletê xwe şermezar e. Ji ber ku qasî dîroka nivîsînê ya kûr a mirovahiyê her ku hatiye xwendin û mirov agahdar in, peyvek ku bi qencî, pesindayîn û başî li ser cerdevanan nehatiye gotin. Di hemû ol û neteweyan de ew hatine tawanbarkirin.

**Nêrîna olî**

Di hemû olan de mirovên herî kirêt mirovên ku li dijî qewmê xwe tevdigerin. Di olê Zerdeştiyê de başî û xirabî weke tarî û ronahiyê bi nav dikin. Di ola mesihî de kesek ji bo fikra miletê xwe belav bike ji gundekî neh caran tê avêtin lê ew cardin di vegere wî gundî û di dawiyê de bi serdikeve. Ev dide diyarkirin ku mirovên ji bo miletê xwe têkoşîn dikin di bin hemû şert û mercan de wê bi ser bikevin û wê serbilind bin li gel xweda û miletê xwe. Di ola îslamê de jî her tim ji bo qewmê xwe cîhad kirin tiştekî pîroz e lê îxanet li qewmê xwe kirin wê çi hesabî bidin Xwedayê xwe. Peyva îslam bi xwe du wateyên wê hene aştî û tenduristî. Şertên îslamê şeş in, hûn wan bi cih tînin ku yek ji wan çêkirina aştyê di nava derdora xwe de ye. Lê hûn di nava du gelan de şer gur dikin.

**Nêrîna neteweyî**

Mirov bi kîjan taybetmendiyên xwe dikevin nava neteweya xwe, mane xala bingehîn hevgirtine. Lê dema ku hûn ne li gel miletê xwe bin wê demê hûn çawa xwe ji wî miletî dihesibînin. Gelo dema ku mirov li hemberî zarokên xwe yan jî ferdek ê malbata xwe çekê bi kar bîne. Wê demê ew bi kîjan rûyî xwe mirov dihesibîne. Mafê wî miletî heye ku wan mirovan ji nava xwe derxin. Ma çi xwedê ji we standiye ku hûn li pêşberî dîrokê xwe wekî rûreş didin nîşandan. Ma zilamtiya we li ku maye. De bila sed zilamên xirab û îxanet li miletê xwe dike xulamiya jinek ya malê bibin. Li Afrîkayê dema ku yekî îxanet li miletê xwe dikirin dişewitandin. Cezayê we çi ye ku hûn ew qas derketine ji derveyî pîvanên mirovahiyê. Hûnê kengî hîs bikin ku hûn mirov in. Di nava ajalan de jî tiştekî wiha nîne tenê ji lawiran ên ku hevaliya we bikin kew in. Ew jî weke we dijminê qewmê xwe ne.

Heya niha jineke cerdevan yan aligirê şîdetê nehatiye bihîstin. We bi zihniyeta xwe ya paşverû jin û zarokên xwe jî tevli wê jiyana reş kirine. Carinan zarokên we dixwazin derkevin nava zarokên derdor lê ji ber rûreşiya we ew nikarin bi dilekî xweş bijîn. Hûn li xwe nafikirin ma hûn li zarokên xwe jî nafikirin. Zihniyeta zilam a deshilatdar û aligirê şer û şîdetê ye. Di nava civakê de pir car gotina ku dibêjin ji sed jinan yek diçe bihuştê û ev gotin gelek tê bikaranîn. Lê em dibînin yên aligirên şer û şîdetê yên ku cehenem ji rûyê wan ê gemar dibarin kî ne.

Gotineke kurdî heye dibêjin çavên li deriyan xwelî li seriyan. Şûna ku kefenê we di çenteyê we de be û ew çenteyê bênamûsiyê li milê we be. Ma hûn li mala xwe karekî ji bo zarokên xwe bikin ne baştir e û bi şereftir e. Hûn li wan çiyayan li çi digerin. Gelo hûn qet fikirîne ku çima hûn vî karî dikin û xwe ji xwedê û dinê dikin.

**Neteweya kurd**

Cerdevan, şane, cehş an jî xwefiroş ji kesên ku ji bo berjewendiyên xwe ên ferdî, malbatî yan taybetî bi dijberên têkoşîna terxankirina çarenûsa gelê kurd re têkilî datînin û di bin fermana wan de bi pereyan dixebitin re tê gotin.

Li gorî gelek zimanzanan di zimanê kurdî de bêjeyên ji bo dijberiya gelê kurd, hemû biyanî ne. Ango di xwezaya zimanê kurdî de ji gelê xwe re bêbextî, îxanet û xerabî kirin nîne. Lewra di felsefeya kurdan de ji gelê xwe re bêbextî û îxanetkirin nebûye. Piraniya van bêjeyan ji zimanên wekî erebî, tirkî hwd ketine kurdî. Kengî ku civakên kurdan têkçûn, hatin bindestkirin, ziman û çanda wan hatin guhertin wê demê jî civak dikeve rewşa herî zor de nexweşiyên derûnî, sosyal û neteweyî xwe dan der û bikaranîna van bêjeyan dest pê kir.

Di dema desthilatdariya împaratoriya osmaniyan de piranî peyva şane dihate bikaranîn. Ji peyayên Alayên Hemîdiye yê re jî her wiha şane digotin. Li başûrê Kurdistanê peyva cehş navdar e. Ji sala 1984'î vir de, li bakurê Kurdistanê ji bandora zimanê tirkî.

Niha li bakurê Kurdistanê bi fermî 87 hezar cerdevan li dijî gelê xwe têdikoşin û li gorî statîstîkên nefermî bi hezaran ciwanên kurd ji bo îxanetê bi gelê xwe re jî, tên perwerdekirin. Navê cerdevanan di gelek karên kirêt û dijmirovane de derbas dibe. Gelek dozên navneteweyî jî dide xuyakirin ku cerdevan gelek mirovên bêsûc dikujin, eroîn û madeyên din ên vexwarinê difiroşin, daristanên Kurdistanê dişewitînin, îşkence hwd. dikin.

Bi taybet piştî salên 1984'an li Kurdistanê sîstema cerdevanî pir zêde bûn. Bi xwe jî nizanim ew çek di berjewendiyê çi de ne. Dibêjin ji ber aboriye lê ev ne pirsgirêk e. Dema ku mirov bi hinek hêcetên madî dijminiya neteweya xwe bike ew çi mirovin. Ma kalikên we yan jî ew Miletên li derdora we bi wê jehra cerdevaniyê ew xudan dikin. Bila mirov rojekê bi serbilindî bijî ne sed salan bi sernizmî û bêşerefî bijî. Gelek ji wan zarokên wan yan jî kesek ji malbata wan li çiyayên Kurdistanê ne, ma dilê wan seyan xwariye ku li hemberî wan çek bi kar tînin. Hûn ne tenê li dijî mirovan in . We zozan û daristanên Kurdistanê jî wêran kirine. Hûnê kengî li xwe vegerin û bibin mirov.

ROJEV

Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mehdi TANRIKULU
Yönetim Yerî:
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstiklal. Cad. No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.

## XAÇEPIRS


**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Kanaleke televîzyona kurdî... Peyva neyînî... Notayek **2.** Ji vir û şûnde, ji niha pê de... Tîpên navîn ê "saet"ê **3.** Xwarina ku xwêya wê zêde ye... Berxika ku piştî qewlê xwe zaye **4.** Kesê ku deng naçê, kesê ku guhê wî nabihîze... Cejn, eyd **5.** Cureyekî nexweşiya lingên pez **6.** Baneşaneke gazîkirinê... Fikr û raman **7.** Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye... Kurtebêja Ksenonê **8.** Sir, tiştê her kes pê nizane... Paytexta Yewnanistanê **9.** Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Kurtebêja otomobîlê... Hejmarek

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Dijberê rengî spî... Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê...Yezdanekî misrî **2.** Beşeke malê, jûr... Edalet **3.** Dijbera jor... Bilind **4.** Muxtar **5.** Cihê ku tam di orteya du tiştî de ye... Şaşwaz, metel **6.** Plakaya navneteweyî ya Îranê... Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax **7.** Agir... (Nivîsa ...) ku ji hêla Med, Faris û Asûriyan ve hatiye bikaranîn **8.** Aşît, şepe, berfende... Ji enîşkê heta qevdika dest **9.** Bajarekî me... Kurtebêja zêr

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | E | Ş | ■ | S | B | ■ | S | S |
| 2 | E | B | E | D | Î | ■ | J | Ê | R |
| 3 | ■ | A | W | A | ■ | T | A | ■ | Y |
| 4 | S | ■ | K | N | K | ■ | L | A | ■ |
| 5 | A | G | ■ | K | ■ | Q | E | R | S |
| 6 | Q | A | H | Î | R | E | ■ | D | O |
| 7 | Î | ■ | I | ■ | A | L | A | ■ | R |
| 8 | ■ | A | L | Î | ■ | E | W | K | ■ |
| 9 | T | R | ■ | Ş | O | M | ■ | Î | D |



# 'Li gorî Erdogan em terorîst in'

Zarokên mexdûrên TMK'ê ên Girtîha Tîpa E ya Amedê bi boneya "23'yê Nîsanê Cejna Zarokan" ji malbatên xwe re 2 name şandin. Zarokan di nameyan de helwestan Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan a li hemberî zarokên filîstînî û li hemberî xwe dan ber hev. Zarokan, "Birêz Erdogan newêre êşên zarokên li welatê wî, yên di girtîgehan de bîne ziman. Lê li ser mexdûriyeta filîstinê radiweste. Ev yek jî diyar dike ku Erdogan me ne wekî zarokên mexdûr, wekî terorîstan dibîne."


Zarokên li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê wiha dest bi nameyê kirin: "Em wekî zarokên gelê aştîparêz û azadîxwaz, ji bo hemû gelan aştiyek bi rûmet dixwazin. slav û rêz û hezkirin û hurmet" Zarokan, anîn ziman ku bi mebesta 23'ê Nîsanê xwestine hêstên xwe par ve bikin û wiha nivîsandin: "Me pîrozbahiyên 23'ê Nîsanê di televîzyonê de temaşe kir. Ligel cejnan êş tên kişandin. Li welatê me bi methek mezin cejna zarokan tê pîrozkirin, çi zû zarokên xwe yên dişînin zindan, sirgun û mirinan ji bîr dikin. Ne mimkun e ku beyî mirov 13 guleyên bera bedena Ugurê 12 salî, topên hewanê yên qanda kîloyên wê Ceylana 13 salî, guleyên kor ên bera Enesan dan û cezayên ku zêdetirî 2 qat temenê me dan me nabînin û bijîn?"

Zarokan, di nameyên xwe de helwestan Serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan a li hemberî zarokên filîstînî û li hemberî xwe dan ber hev û wiha dom kirin: "Birêz Erdogan newêre êşên zarokên li welatê xwe yên di girtîgehan de dijîn bîne ziman. Lê diçe êşa zarokên mexdûr ên filîstinê tîne ziman. Em vê yekê fêm nakin. Bi vê yekê diyar dibe ku Erdogan me ne wekî zarokan, wekî terorîstên dixwazin welat perçe bikin dibîne. Bi vê yekê jî bi sînor namîne û hewl dide vê yekê bi hemû kesî bide qebûl kirin. Hişmendiya di bin navê hêza bi asayî de zarokan bi zorê ji dayika wan distîne û bi erdê re kaş dike, pêkanînên xwe wekî terorîzmê nabîne, lê kevirên qaşo em davêjin jî wekî helwestek terorîstî dihesibînin."

**Şermezar kirin**

Zarokan, di nameya xwe de helwesta Tirkiyeyê ya li hemberî zarokan bi zimanekî qerfî anîn ziman û wiha dirêjî dan nameya xwe: "Wisa xuya dike ku welatê me di warê nêzîkatiya li hemberî zarokan armanc dike bikeve Pirtûka Rekoran a Cîhanê û ger pêkanînên demên dawî jî bên destgirtin tê wê wateya ku bi ser ketiye jî. Em wekî zarokan ketina Pirtûka Rekoran a Cîhanê ya ji ber helwesta li dijî zarokan a nebaş em bi tundî şermezar dikin. Ger hê jî van êşên tên kişandin nabînin û hewl didin bikevin pirtûka rekoran em ji wan re serkeftinê dixwazin."

Zarokan nameya xwe bi dirûşmeyên, "Bijî aştî û azadî, Bijî biratiya gelan" bi dawî kirin. **AMED**


23.04.2010

Barışa ve özgürlüğe susamış bir halkın çocukları olarak tüm onurlu barış isteyen halklara sevgi saygı ve selamlarımızı yolluyoruz.

Bugün, 23 Nisan Çocuk Bayramı vesilesiyle duygularımızı sizlerle paylaşmak istedik. TV'de izlediğimiz kadarıyla ülkemizin tüm yerlerinde bayramın verdiği coşkulu anların şahidi olduk. Birde bayram olsa bile acıların halen yaşandığı ve yaşanmakta olan yerlerin olduğunu görmek gerekir. Çocuk bayramını övünerek kutlayan ülkemiz kendi çocuklarını zindanlara, sürgünlere ve ölümlere sürdüklerini ne çabuk unuttular! 12 yaşındaki Uğurların bedenine 13 kurşunu, 13 yaşındaki Ceylanların kilosu kadar hava topunun, Eneslere kör kurşunları ve daha nicelerimize hediye ettikleri yaşlarımızın 2 katı cezaları görmeyip yaşamak mümkün mü?

Sayın Erdoğan'ın kendi ülkesinde, kendi zindanlarında bulunan bizlerin acılarını dile getirmekten korkarken Filistin'deki mazlum çocuklara dikkat çekmesine anlam veremiyoruz. Galiba bizler Erdoğan'a göre çocuk değilde, ülkeyi parçalama isteyen teröristiz. Kendisiyle sınırlı kalmıyor, onun ötesinde ülkemizdeki tüm insanlarımıza öyle algılatmaya çalışıyor. Daha geçenlerde Orantılı güç adı altında annesinin kollarından zorla alınıp yerde sürükleyen zihniyet, kendi yaptıklarını terörizmden saymıyorda, bizim sözde atmış olduğumuz taşlarımızı

# Pûşî û şewqe jî bû suc!

Der barê zarokên ku kevir avêtine polîsan de ji bo ku hin tişt bên guhertin li aliyeke nîqaş tên kirin li aliyê din pêkanînên balkêş tên rojevê. Li Stenbolê 3 jê zarok 6 kes ji ber ku beşdarî çalakiya şermezarkirina "operasyona vegera jiyanê" hatibûn girtin. Derket holê ku sedama girtina zarokê bi navê R.A.K tîşorten li ser wan wêneyê Che hene, pûşî û şewqe ne.

Doza 6 kesan dê di 14'emîn Dadgeha Cezaya Giran a Stenbolê de, di 30'yê nîsanê de bê dîtin. Temenên zarokên bi navê R.A.K, Ç.K û B.Y 17 û ji 17'î biçûktir in. Zarok di çalakiya protestokirina operasyona vegera jiyanê de di 19'ê kanûna 2009'an de hatibûn binçavkirin û ji ber ku nêzî cihê ku çalakî hatiye lidarxistin bûne jî hatibûn girtin.

**Hinceteka balkêş**

R.A.K ê ku li Girtîgeha Zarokan a Maltepeyê li benda danîşînê ye bi sedemeke balkêş hatiye girtin. Ji ber ku tîşortê ku wêneyê Che li ser e li xwe kiriye û bere û şewqe li ser wî hebûye ev yek wekî delîlê suc hatine dîtin. Ev yek wekî delîlên ku R.A.K endamê rêxistinê ye xurt dikin hatine hesibandin.

Derket holê ku rapora R.A.K'ê ya "kêm mezin dibe" heye. R.A.K'ê ji Nexweşxaneya Tibê ya Zanîngeha Marmarayê rapor wergirtiye. **STENBOL**

# Qereqolên seyar tên avakirin



Bi destpêka germahiya hewayê re sewqiyata leşkerî zêde dibin û operasyonên leşkerî berfireh dibin. Her wiha bi zêdebûna operasyonan re li seranserî sînorê Îran û Iraqê ku ji nêzî 250 kîlometreyî pêk tê mewziyên leşkeran tên avakirin û li gel qereqolên heyî qereqolên nû yên seyar tên avakirin.

Bi taybetî li navçe Çel, Gever û Şemzînanê sewqîyatên leşkerî zêde dibin û yekîneyên leşkeriyê tên bicihkirin. Herî zêde jî li Herêma Zapê operasyon fireh dibin.

**Qereqolên nû**

Li Sînorê Iraq û Tirkiyeyê ligel qereqolên heyî qereqolên nû tên avakirin. Li sînorê Îranê ligel tabûrên Qasren, Kotol, Sînor a Bajirgehê, Omemar, Şitazn, Ramuda û Tabûra Sînor a Oremarê û qereqolên Kokep, Qereqola Cendermeyan a Bajirgehê, Şahê, Wargenim, Aytepe, Kamber, Aylava, Sineva, Serdeşt, Sêrengol û Qereqola Girê Gulordê qereqolên seyar tên avakirin. Dîsa li Herêma Kelya Şin, Kivana, Çemê Xalo, Mevade qereqolên nû tên avakirin.

Li Sînorê Şemzînanê jî qereqolên nû hatin avakirin. Li seranserî Sînorê Îranê ligel qereqolên Bezele, Harunan, Dinarte, Bêdevê, Katînê, Helanê, Garê, Bêsosin, Şebatana Gerdiyan, Şebatan Şemzînan, Mavan, Beroj, Sûlê, Giranê, Leylek û Tanyol li sînor qereqolên nû tên avakirin. Herî dawî li herêma Bîgişnê, Deryê Ketînê, Xakurkê 5 qereqolên nû hatin avakirin.. Dîsa li herêma Salara û Dûre li girên Akbalik, Mîreva, Soranser yekîneyên seyar hatin bicihkirin.

Li sînorê Çelê û Iraqê heta niha seranserî sînor qereqol hatine avakirin. Li gel van qereqol û tabûran Berêreş, Kurkî, Deştan Zêryê, Darsînkî, Eriş, Girê Geryayî, Bilêcan, Morikî û Zîyaniş, Qupî dîsa gelek qereqolên nû hatin avakirin. Her wiha dîsa li herêmê yekîneyên Fermandariya Tûgaya Bolu ya Kayserî dîsa li herêmê hatin bicihkirin. **COLEMÊRG**

# Nehîştin kes bên hawara wan

## Welatiyê bi navê Ercan Ugur ê ku ji aliyê leşkerên Îranê ve hate birîndarkirin got ku piştî ku ew hatine gulebarankirin leşkerên Îranê û yên tirk nehîştine gundî bên alîkariya wan. Her wiha leşkeran bibirîndarî li wî xistine

Li navçeya Qelqeliya Wanê, welatiyê bi navê Ercan Ugurê ku di dema qetilkirina Suat Ugurê 15 salî li ser sînor ji aliyê leşkerên Îranê ve birîndar filitî, diyar kir ku kesê bi navê Tarik Kefê ku li cem wan bûye ji aliyê leşkerên Îranê ve hatiye binçavkirin. Ugur got, "Piştî qetilkirina Suat, leşkerên Îranê, leşkerên tirkan nehiştin gundî bên alîkariya me û bi birîndarî li min xistin"

Li gundê Balçokluya Jorî ya navçeya Qelqeliyê ku li ser sînorê Îran û Tirkiyeyê ye beriya çend rojan Suat Ugur ê 15 salî bi hinceta qaçaxgeriya mazotê dike, ji aliyê leşkerên Îranê ve hatibû qetilkirin û welatiyê bi navê Ercan Ugur ê 26 salî jî birîndar filitî bû. Ercan Ugur ku li Nexweşxaneya Lêkolînê ya Fakulteya Tibê ya Zanîgeha Yuzuncu Yilê ya Wanê tê dermankirin, bûyer vegot. Ugur, diyar kir ku dema bûyerê ji aliyê leşkeran ve bi birîndarî hatiye girtin got ku leşkeran di wî halî de bi daran li wî xistinê.

Ugur, da zanîn ku di dema mudexaleya leşkerên Îranê de gundiyê bi navê Tarik Kef jî ji aliyê leşkerên Îranê ve hatiye binçavkirin û wiha axivî: "Dema ku me di xwest ji sînor derbas bibin leşkeran gule berdan me. Hem ji aliyê Îranê hem jî ji aliyê tirkan gule barandan me. Ez birîndar bûm û çûm cem leşkerên Tirkiyeyê. Leşkerên ku ez çûm cem leşekerên Qereqola Onurtepeyê bûn. Dema ez gihiştim wê derê leşkeran bi daran li min xistin û gilî li min kirin. 2 hespên min yên birîndar jî desteserkirin û hespek min li wê derê bi guleyan kuştin. Nehiştin gundî jî bên alîkariya me. Piştî demekî gundiyan ez anîme nexweşxaneyê."

**Bi birîndar li wê derê hiştin**

Bavê Ercan Ugurê ku tê derman kirin, ku di heman demê de apê Suat Ugurê ku jiyana xwe ji dest daye Medenî Ugur jî got ku kurê wî û biraziyê wî bi birîndarî hatine girtin û ji aliyê leşkerên tirk ve li wir hatine hiştin. Medenî Ugur, wiha got: "Leşkerên Qereqola Onurtepeyê nehiştine gundî biçin hewara biraziyê min Suat. Biraziyê min birîndar bû heke leşkeran destur dabûna gundiyan biraziye min ne dimir. Di vê navberê de li kurê min yê birîndar jî xistine. Em ê serî li riyên hiqûqê bidin."

**Serî li ÎHD'ê dan**

Di aliye din de Sedat Ugur ku ew jî ji bûyerê birîndar filitiyê û xizmên Ercan Ugur ji bo alîkariya hiqûqî bigirin serî li ÎHD'a Wanê dan.

Li ser, serlêdana malbatê rêveberên ÎHD'ê li nexweşxanê ye bi Ercan Ugur re hevdîtinek pêkanî. Rêveberên ÎHD'ê diyar kirin ku dê ji bo ronîkirina bûyerê bikevin nava hewldanan. **(WAN / DÎHA)**

# Cenazeyê Bargîn hate definkirin

Cenazeyê Eşref Bargîn ê (23) yê li navçeya Qerqeliyê ya Wanê li ser sînorê Îran û Tirkiyeyê ji aliyê leşkerên Îranê ve hatibû qetilkirin hate definkirin.

Cenazeyê Eşref Bargîn ê li nêzî gundê Axurêkê yê navçeya Qerqeliyê ji aliyê leşkerên Îranê ve hatibû qetilkirin ji aliyê malbatê ve ji morga Nexweşxaneya Dewletê ya Wanê hate girtin. Cenazeyê Bargîn piştî ku ji nexweşxaneyê hate wergirtin li gundê Axurkê ji aliyê malbat û gundiyan ve hate definkirin. **WAN**

# 8 leşker hatin kuştin

Di pevçûna duh şevê ya li Şemzînanê pêk hat de 2 leşker mirin û 2 leşker jî birîndar bûn. Li sînorê Başûr jî 6 leşker hatin kuştin.

Li gorî daxuyaniya Walîtiya Colemêrgê pevçûn li çoltera navçeya Şemzînanê di navbera leşker û HPG'iyan de derketiye. Walîtiyê daxuyand ku di pevçûnê de çawişekî pispor û leşkerek mirine û 2 leşker ji birîndar bûne.

Li aliyê din di navbera leşkerên ku xwestin derbasî Başûr bibin û HPG'iyan de pevçûn qewimî û 6 leşker hatin kuştin. **COLEMÊRG**

www.arsivakurdi.org

# 'Em bi rizandina civakê re rû bi rû ne'

## Hevserokê KCD'ê Yuksel Genç ji bo bûyera tecawizê anî ziman ku bi rizandina civakê re rû bi rû ne û hindekar Nukhet Sîrman jî diyar kir ku hewldana hikûmetê ya veşartina bûyerê ji tirsa windakirina erk û hakimiyetê diqewime

Hevseroka KCD'ê Yuksel Genç, têkildarî tacîz û tecawiza li Sêrtê pêk hat diyar kir ku ew bi rizandina civakê re rû bi rû ne û wiha got: "Ev bûyer bi pevçûnên li herêmê re raste rast têkildar in. Divê ev yek baş bên lêkolînkirin."

Yuksel Genç, der barê bûyerên tacîz û tecawizê yên li Sêrtê pêk hatin daxuyaniyek nivîskî da çapemeniyê. Genç, diyar kir ku ev bûyerên pêk tên di warê sincî û civakî de civakê bi rizandinê re rû bi rû dihêlin û Genç, destnîşan kir ku ne tenê di warê polîtîk, di her alî de aloziyek kûr heye û wiha got: "Ji ber serdestî û feraseta mêr ev hişmendî û polîtîkayên ku civakê dirizîne peş dikeve. Berê jî peyvirdarên raya giştî û perwerdehiyê hatibûn agahdarkirin û hişyarkirin. lê li gel vê yekê tu lêpirsîn û detbîr nehatin stendin. Ev bûyerên ku 2 sal in li Sêrtê bêk tên encama îflasa polîtîkayên dewletê ye. Rayedarên dewletê dibêjin 'Li şûna çalakiyan bikin bila fihûşê bikin.' Dîsa dibêjin 'Zêde mezin nekin' û dixwazin wekî bûyerek asayî bidin xuyakirin. Ev yek nayê qebûl kirin." Genç, destnîşan kir ku ev yek encama hişmendiya mêr û polîtîkayên şer in û wiha dom kir: "Divê ev bûyerên ku ji ber pevçûn û şerê heyî pêk tên zêde û bi baldarî bên lêpirsîn. Ev yek berdewama polîtîkayên şerê 30 salî ne. Dîsa berdewama polîtîkayên înkar û îmhaya 80 salî ye."

**'Divê tedbîr bên girtin'**

Genç, destnîşan kir ku polîtîkayên tên meşandin rizandina civakî û xizaniya herêmê armanc dike û xwest di demek nêzîk de tedbîrên mezin bên girtin. Genç, xwest ji bo rêlipêşigirtina van bûyeyaran zagon ji nû ve bên sererastkirin û hemû kes li hemberî van bûyeran hişyar bin." **STENBOL**



### Tecawizê wekî mafekî dibînin

Meclîsa Dêrsimê ya jinan tecawizên li Sêrtê û tecawiza ku li dijî Endama Meclîsa BDP'a Amedê D.A'yê pêk hatî şermezar kir. Hat gotin ku hikûmeta AKP'ê bizanebûn û bi xwest zilamên ku tecawizê ji xwe re wek mafekî dibînin dihelbirîne.

Daxuyanî li Salona Konferansa Belediyeya Dersimê hat dayîn. Şaredara Dersimê Edîbe Şahîn, saziyên jinan ên Dersimê û gelek jin beşdarî daxuyaniyê bûn. Daxuyanî ji aliyê Hevseroka BDP'a Dersimê Amber Bataray ve hat xwendin. Hat gotin ku li herêmê şerekî ku hê nav lê nehatiye kirin tê meşandin. Hat aşkerakirin ku hikûmet bi bêdengiya xwe piştgiriya van tacîzkar û tecawizkaran dike. Bataray wiha vegot: "Em dibin şahid ku li Tirkiyeyê bi polîtîkayên AKP'ê yên îslmana nerm çanda tacîz û tecawizê jî li pêş dikeve. He wiha kesên ku li henber van bûyeran dengê xwe derdixin jî ji aliyê hikûmetê ve denê wan tê birîn." Bataray da zanîn ku desthilatiya heyî bi hişmendiya tune hesibandina bûyeran, bi polîtîka min nedî û nebihîst pêvajoyê bi rê ve dibe. Batarayê vegot ku parlamenterê ku pirsgirêkê vî gelî tîne ziman jî ji aliyê vê hikûmetê ve tên bêdeng kirin. **DÊRSIM**

### 'Ji bo ku hakimiyeta wan winda nebe dibêjin mezin nekin'



Prof. Dr. Nukhet Sîrman bertek nîşanî gotinên hikûmetê yên der barê tecawiza Sêrtê pêk hatibû ya bûyer tê mezin kirin da û wiha got: "Ger hûn di têkiliyên civakî de newekheviya cinsî fêm nekin ne mimkun e pirsgirêk çareser bibe. Ger neyê aşkera kirin ev bûyerê zêde bibin. Di encamê de hîn kes naxwazin hakimeyata ku wan afirandiye zirarê bibîne û ji ber vê yekê dê bibêjin bûyerê mezin nekin."

Ji ber ku sedemên bûyerên tacîz û tecawîzê baş nayê nîqaşîna û ji bo çareseriyê rê û rêbaz nayên nîşandan mexdûr û suçdarê vê meselê wekî hemû civak tê nîşandan. Hîndekara Zanîngeha Bogazîçiyê Prof. Dr. Nukhet Sîrman diyar kir ku bêdengbûn hem ji bo mexdûr û hem jî ji bo yên xwedî erk mijara nirxandinê ye. Jin û zarok ji ber nasnameya xwa ya civakî her tim mexdûr in û ev yek jî bi sedema mekanîzmaya 'nikarim tiştekî bikim' pêk tê. Sîrman da zanîn ku sûçdar û yên xwedî erk di heman mebestê digihêjin hev û mijara bêdengiyê de hev dikin. Sîrman destnîşan kir ku yên bi hêz ji ber hêzê û yên mexdûr ji ber bêheziyê bêdeng dimînin.


Sîrman bilêv kir ku sedema pirsgirêkê newekheviya cinsî ya civakê ye û Sîrman wiha axivî: "Hewldanên şaredar, serokwezîr ya em vê mijarê mezin nekin û ev karê çend kesên xwe nezan in nîşan dide ku mebest veşartina bûyerê ye. Li vî welatî têkiliya cinsî ya serdest û bindestan tê veşartin. Ji zarokan re tê hîn kirin ku bi riya cinsî hakimiyetê biafirînin. Ger em newekheviyê fem nekin em nikarin mijarê çareser bikin û ger em çareser nekin bûyerên bi vî rengî di nav civakê de her biçe dê zêde bibin. Yên xwedî erk û hakimiyetê ji bo ku hakimiyeta wan winda nebe dê bibêjin vê bûyerê mezin nekin." Sîrman da zanîn ku ji bo çareseriya pirsgirêkê divê bingeha pirsgirêkê bê fêmkirin û bi derxistina zagonan ve ev pirsgirêk çareser nabe. **STENBOL**

# Zextên li ser xwendekaran zêde dibin

Her diçe zextên li ser xwendekarên kurd zêde dibin. Li Amedê bi hevkariya rektorî û polîsan ve 100 xwendekar hatin binçavkirin, li Denîzliyê xwendekarên kurd rastî lêdanê tên û li Tokatê jî polîsan li ser malê xwendekaran de girtin û 6 xwendekar binçavkirin.

Endamên Komeleya Xwendekarên Zanîngeh Dîcleyê (DUO-DER), diyar kirin ku hejmara kesên hatine binçavkirin ji 100'an boriye. Xwendekaran xwest ku demildest hevalên wan ên hatine binçavkirin bên berdan û wiha got: "Em bang li hêzên dewletê yên ewlehî û hevkarên wan dikin ku ya ji dest we tê, bikin. Em jî li hemberî êrîşên vê peragalê bêdeng namînin û em ê li ber xwe bidin."

Xwendekaran li Parqa Koşuyoluyê daxuyanî da çapemeniyê. Di çalakiyê de rêveberên BDP'ê yên bajar û navçeyan, şaredarên navçeyan, ESP, DYG, ÎHD, SELÎS, Înîsiyatîfa Dayîkên Aştiyê û gelek nûnerên rêxistinên civakî yên sivîl jî piştgirî dan daxuyaniya xwendekaran. Li ser navê xwendekarên DUO-DER'ê xwendekara nedixwest navê xwe bide daxuyanî xwend û diyar kir ku polîtîkayên dewletê yên zext, bişavtin û bindestkirinê didomin û ciwanên li hemberî vê yekê li ber xwe didin bûne hedefa polîtîkayên wan. Xwendekaran wiha got: "Zanîngeha Dîcleyê li hemberî pergalê misyonekî şoreşgerî, welatparêz û demokratîk girtiye ser milê xwe. Ji ber vê yekê bûye hedefa zihniyeta faşîzma 12'ê Îlonê. Vê ramana faşîst û ji mirovahiyê dûr hevalekî me qetil kir. Gelek hevalên me jî girtin û niha jî dixwazin me bêdeng bikin. Ji bo vê yekê hemû rêbazan bi kar tînin." Xwendekaran, da zanîn ku di nav sala dawî de 2 xendekarên Zanîngeha Dîcleyê ji aliyê hêzên dewletê ve hatine qetilkirin û gelek xwendekar jî hatine girtin. Her wiha der barê gelek xwendekaran da jî lêpirsîn hatine vekirin.



**Li Tokatê binçavkirin**

Li Tokatê, li navenda bajar di navbera xwedekaran de şer derket. Polîsan angaşt ku şer li ser navê "Rêxistinê hatiye kirin" û gelek xwendekar di encama serdagirtinên malan de binçav kir. Ekîbên polîsan deriyên gelek malan şikandin û têde lêgerîn pekanîn. Piştî lêgerînan xwendekarên Zanîngeha Gazîosmanpaşayê yên bi navê Murat Yaman, Kasim Dagkiran, Ayhan Benek, Şiar Aytan, Mustafa Karatepe û xwendekarê bi navê Hasan ku paşnavê wî nahetiye hînbûn, hatin binçavkirin. Li gel ku xwendekar li Midûriyet Polîsan a Tokatê tên girtin, hate îdiakirin ku xwendekarê bi navê Murat Kelek ji bo rewşa hevalên xwe hînbibe çûye qereqolê, li wê derê rastî gefan hatiye û piştî gefan agahî jê nehatiye girtin.

**'Ewlehiya canê me nîn e'**

Xwendekarên kurd ku li Bekiliya Denîzliyê ya Zanîngeha Pamukkaleyê dixwînin rastî gefan tên. Bi taybet jî esnafên navçeyê gefan xwendekaran dixwin û dibêjin progandaya PKK'ê dikin. Li dijî pêkanînan serîlêdana xwendekaran ya ku serî emniyetê û îdareya dibistanê dabûn lê tu encam negirtin. Hefteya borî xwendekarên kurd Mehmet Sarikaya, Hamza Bengîz, Metîn Çarkli, Galîp Şeker, Mehmet Zakîr Çapan, Şaban Çelîk rastî lêdanê hatin û Hanim Suh, Rahîme Çokbîlîr û Fadîme Ozer jî rastî taciza gotinan hatin. **DENÎZLÎ - TOKAT - AMED**

# Êlih ji bo mitînga 1'ê Gulanê amade ye

Endamên Komîteya Amadekar a Mitînga heremî ya 1'ê Gulanê Cejna Karkeran, diyar kirin ku amadekariya wan hatiye asta dawî. Komîteyê ji her kesî xwest ku beşdarî mîtîngê bibin. Her wiha di çarçoveya xebatên mîtînga 1'ê Gulanê Cejna Karkeran a herêmê de, 10 hezar belavok hatin belavkirin.

Êlih dê îsal ji bo pîrozbahiya mîtînga 1'ê Gulanê ji Sêrt, Şirnex, Amed, Mêrdin û navçeyên wan re malevaniyê bike. Mitînga ku dê di 1'ê Gulanê roja şemiyê li Qada Cumhuriyetê pêk bê, di nava wan de Serokê DTP'a hatî girtin Ahmet Turk, Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, Serokê Giştî ya Petrol Îş'ê, endamê MYK ên KESK'ê jî dê beşdarî pîrozbahiyê bibin. Amadekariya mitîngê ber bi dawî ve diçe. Her wiha wê Koma Kemençê, Koma li Behrareş Koma Nena û Koma Çiya dê bi stranên xwe reng bidin mitîngê. Mîtîng dê roja şemiyê seat di 10.30'an de li ber Otela Zekî bicivin û bi kortêjekê heta Qada Cumhuriyetê bimeşin. Endamê Komîteya Amadekar û Serokê Şaxa Egîtîm Sen'ê yê Êlihê Salîh Erol, diyar kir ku mîtîng ji bo wan gelek girîng e û dê îsal bi ruhê pîrozbahiya Newrozê 1'ê Gulanê pîroz bikin. Erol, destnîşan kir ku ji bo beşdariyek baş pêk bê, xebatên wan didomin û wiha got: "Serlêdanên pêwîst hatin kirin û hate qebûlkirin. 1'ê Gulanê ji bo me ne tenê cejna karker û karmendan e, her wiha cejna hemû gelên bindest, karkerên li ser erd, înşeat û senayiyê de dixebitin, bi kurtasî kesên bi keda xwe qezanc dikin e." Em bang ji bilî endamên xwe li hemû kesan dikin ku ji bo pêşeroja gelê xwe, ji bo perwerdehiyekî rast, karek bi ewlehî, xebatek bi kadro, em dê li qadê bin."

Serokê Komîteya Amedakar a 1'ê Gulanê û Serokê Şaxa Genel Îş'ê yê Êlihê Halîs Yakut jî, da zanîn ku bi pîrozbahiya li Qada Taksîmê re li Êlihê bi mitîngekê dê têkoşîna demokrasî û azadiyê xurt bikin. Yakut, wiha got: "Piştî 10 salan yekem car e li Qada Cumhuriyetê ya Êlihê 1'ê Gulanê dê bê pîrozkirin. Em bang, li hemû odeyên esnaf û zenaatkaran bigire heta esnafên pîşesazî, sanayî, ji esnafên biçûk bigire heta tabanên partiyên siyasî dawetê mitîngê dikin." Yakût, der barê amadekariyên mîtîngê de wiha axivî: "Ji bo em gel vexwuynin mitîngê me bi sedan afîş belavkirin û bi dehan pankart daliqandin. **ÊLIH**

# Egîtîm Sen: Li dibistanan şîdet zêde dibe

Serokê Egîtîm Sen'a Êlihê Salîh Erol diyar kir ku di demên dawî de li dibistanên navîn û lîseyan de bûyerên şîdete zêde dibin û wiha got: "Divê hemû kesên eleqedar bên cem hev û maseya krîzê çêbikin. Ji bo ku şîdeta dibistanan bi dawî bibe divê plana çalakiyan bikeve meriyetê."

Serokê Egîtîm Sen a Êlihê Salîh Erol bi lêv kir ku di demên dawî de li dibistanan bûyerên şîdetê zêde bûne.

Der barê bûyerên şîdetê û şîdeta ku li dijî endamê wan Abdurrahman Basutçu pêkhatiya di avahiya Egîtîm Sen a Êlihê de daxuyanî hat dayîn. Erol bilêv kir ku sedema şîdeta dibistanan Wezareta Perwerdehiyê ye û wiha axivî: "Berpirsyarê van bûyeran di serî de Wezareta Perwerdehiyê û hemû kesên eleqedar in. Pergala perwerdehiyê bûye textê ceribandinê û di encama vê de şîdeta cinsî, ruhî û fîzîkî her roj bi awayekî cûda derdikeve holê. Bûyera ku li Sêrtê qewimî nakokiya pergala perwerdehiyê dide nîşandan." Erol anî ziman ku divê demildest maseya krîzê bê çêkirin. **ÊLIH**

# BDP ji bo mertalên zindî bernameyê derdixe

Serokên bajêr ên BDP'î ji bo ku pêşveçûnên dawî binirxînin li Enqereyê li navenda giştî ya BDP'ê civînek pêk anîn. Di civînê de mijarên wekî operasyon, mertalên zindî, guhertina makezagonê hate nîqaşkirin û hat gotin ku der barê mijara mertalên zindî bername tê derxistin.

Civîn bi serokiya hevserokên BDP'ê Selahattin Demîrtaş û Gultan Kişanak pêk hat û di civînê de bi taybet jî guhertina makezagonê, amadekariyên operasyonê û zextên ku li ser BD'ê tên meşandin hatin nirxandin. Hate hînbûn ku di mijara guhertina makezagonê de serokên bajêr ên BDP'î agahiyan bidin. Her wiha di civînê de mijara pirsgirêka kurd bê nîqaşkirin û dê bê gotin ku hikûmet ji bo çareseriya pirsgirêka bi BDP'ê re têkiliyan danayne û ji bo xebatên ku BDP'ê pêk bîne nîqaş bên kirin.

Her wiha hat gotin ku mijara li dijî operasyonan ya mertalên zindî bernameyek bê derxistin û li gorî bernameyê amadekarî bên kirin û piştî bername û nirxandinan kêmasiyên heyî careke din li ber çav bê derbaskirin û kêmasî bên temamkirin. Di civînê di ji bilî mijarên rojevê mijarên wekî zext û operasyonên ku 2 sal in li ser siyasetmedarên kurd tên meşandin kampanyayeke rêxistinbûyînê bê nîqaşkirin û li gorî vê bernameyek bê derxistin. Dîsa bi girêdayî mijara kampanyayê rêxistinbûyînê dê bi mijara guhertina makezagonê dê BDP sekneke çawa diyar bike agahî bê dayîn û starta hilbijartinê ji niha ve bê dayîn.

Îro jî Meclîsa Jinan ya BDP'ê û serokên bajêr yên BDP'î civîneke hevpar lidarbixin û di vê civînê de jî di serî de mijarên tacîz, tecawiz û mijarên din bên nîqaşkirin. **ENQERE**

# Banga 'operasyonan rawestînin'

## Li Kurdistanê operasyonên leşkerî her diçin zêde dibin. Serok û rêveberên partiyên EMEP, ODP û SDP'ê li dijî operasyonên tên meşandin nerînên xwe anîn ziman û xwestin di demek nêzîk de dawî li operasyonan bê

Nûner û rêveberên EMEP, ODP û SDP'ê têkildarî operasyonên li herêmê didomin fikarên xwe anîn ziman û xwestin di demek nêzîk de operasyon bi dawî bibin.

Cîgira Serokê Giştî yê SDP'ê Yeşim Ergul, diyar kir ku ligel nixaşên hewldana çareseriyê li herêmê operasyon tên meşandin û wiha got: "Ev wekî 'bêçareseriya bi cila ye'. Divê her kes di vî alî de baldar be. li ser navê operasyona KCK'ê hemû siyasetmedarên kurd xistin girtîgehan. Nizanim zarokên bêguneh ên gelekî bi hinceta kevir avêtine tên darizandin û girtin. Dîsa jinên kurd rastî tacîz û tecawizê tên. Ev şerekî tevahî ye." Ergul, anî ziman ku operasyonên li herêmê tên meşandin ji AKP'ê ne serbixwe ye û wiha dom kir: "Êrîşa li dijî Hevserokê DTP'a hate girtin Ahmet Turk jî di heman çarçoveyê de pêk hat. Ger ku operasyon zêde bibin dê agahiyên kuştinê jî bên. Divê di demek nêzîk de dawî li van operasyonan bê. Ev operasyon dê zêdetir zirarê bidin welatiyên xizan. Ger ku pêdivî pê hebe em jî dê piştiriyê bidin çalakiyên mertalên zindî yên BDP'ê."

**AKP durû ye**

Cîgirê Serokê Giştî yê ODP'ê Haydar Îlker jî anî ziman ku ancak pirsgirêka kurd bi riyên demokratîk û diyalogê çareser bibin û wiha got: "AKP'ê angaşt ku di serî de pirsgirêka kurd, gelek pirsgirêkan çareser bike. Lê dîsa ligel ku me zanîbû AKP ne demokrat e, ji bo çareseriya pirsgirêkê, aştî, demokrasî û bi boneya bes ciwan bên kuştin me piştgirî da AKP'ê. Li gel vê yekê mixabin dîsa siyasetmedarên kurd, şaredar û nûnerên kurdan hatin girtin. Hemû hewldanên çareseriyê di axaftinê de man. Li vir durûtî heye. AKP di mijara pirsgirêka kurd de ne samîmî ye." Îlker, têkildarî agahiyên dê dîsa pevçûn derkeve jî fikarên xwe anî ziman û wiha got: "Ger ku pevçûn derkeve dê dîsa pêvajoya 30 salan a pevçûnê geş bibe. Divê çek bêdeng bibin. Ji bo operasyon bi dawî bibin em dê piştgiriyê bidin BDP'ê û çi têkeve ser milê me em dêbikin."

**'AKP dixwaze tasfiye bike'**

Cîgira Serokê Giştî yê EMEP'ê Selma Gurkan jî bertek nîşanî nêzîkatiya li dijî kurdan û operasyonan da û wiha got: "Hikûmeta AKP'ê pirsgirêka kurd ji nedîtinê tê.


Selma Gurkan


Haydar İlker

Hewldanên çareseriyê jî perçeyekî vê yekê ye. Li ser navê hewldana çareseriyê li dijî kurdan polîtîkayên tunekirinê dimeşîne. Bi van polîtîkayan pirsgirêk çareser nabe." Gurkan, da zanîn ku Hikûmeta AKP'ê aligirê leşkeran e û wiha dom kir: "Ger ku pevçûn derkeve dê dîsa hestirên gerîlla û leşkeran birje. Divê her kes li hemberî vê yekê dengê xwe bilind bikin." **ENQERE**


Yeşim Ergul

## Destûr nedan şaredar bibînin

Heyeta ku ji BDP'iyan pêk tê xwestin şaredarê Îdirê Mehmet Nurî Guneş ku di girtîgeha Erzeromê de dimîne ziyaret bikin lê dozgeriyê nehiştin hevdîtin pêk bê. Heyeta ku ji şaredara Bazîdê Canan Korkmaz, cîgirê şaredarê Îdirê Huseyîn Malk, serokê BDP'a Îdirê Salih Dîkiz, serokê TUHAD DER'a Bazîdê Ahmet Kaya û seroka Meclîsa Giştî ya Wanê Semîra Varli pêk tê xwestin ku şaredarê Îdirê Mehmet Nurî Guneş ku li Erzeromê di girtîgehê de ye ziyarte bikin. Heyetê ji bo ziyaretê serî dozgeriyê dan lê dozgeriyê bi hinceta ku 'Ji bo hevdîtan kesên ku di çarçoveya Têkoşîna Li Dijî Terorê de tên girtin divê destur ji wezaretê bê girtin' destur nehat dayîn. **ERZEROM**

## Demîrtaş û Turk diçin Amerîkayê

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û hevserokê DTP'a ku hatiye girtin û li ser qedexeya siyasetê heye Ahmet Turk dê hefteya tê ji bo hîn hevdîtinan biçin Amerîkayê.

Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û hevserokê DTP'a ku hatiye girtin û li ser qedexeya siyasetê heye Ahmet Turk dê 2'yê gulanê de ji bo hîn hevdîtinan biçin Amerîkayê û cîgira hevseroka BDP'ê Emîne Ayna jî di nav heyetê de cih digire. BDP yekem car ji bo ziyaretê diçe Amerîkayê û di ziyaretê de buroya BDP'ê ya Washingtonê bê vekirin. Heyet dê 6 rojan li Amerîkayê bimînin û ji bilî vekirina buroyê dê hîn hevdîtinan pêk bînin. Heyeta BDP'ê dê di Enstîtuya Broonkingsê de beşdarî panela bi mijara pirsgirêka kurd bibin û dê li San Fransiscoyê beşdarî civîna gel ya berfireh bibin û pêşveçûnên Tirkiyeyê bên nirxandin.

Bi boneya vekirina buroyê BDP'î dê bi parlamenterên DYA'yê û hîn siyasetmedaran re li Washingtonê resepsiyon bê dayîn û bi vê vesileyê di mijara pirsgirêka kurd de hevdîtin pêk bê.

Civîna heyeta BDP'ê ya herî girîng jî dê bi cîgirê Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê re pêk bê. Wisa tê texmîn kirin ku di hevdîtinê de pirsgirêka kurd bê nîqaşîn û BDP'ê ji DYA'yê bixwaze ku 'ji bo çareseriya pirgirêka kurd alîkariya erênî bidin'. BDP'î dê peyama ger operasyona ku pêk bê dê pirsgirêkê kûr bike û bi rêbazên leşkerî ve pirsgirêk nayê çareser kirin û feydeya vê yekê ne digihêje welatên herêmê ne jî digihêje Amerîkayê. Heyet dê piştî hevdîtinan di 8'ê gulanê de vegerin Tirkiyeyê.

6'ê nîsana 2009'an de Serokê DYA'yê Barack Obama dema Tirkiye ziyaret kiribû bi Ahmet Turk re hevdîtinek pêk anîbû. Obama yekem car siyasetmedarekê kurdê tirkiyeyî re hevdîtin pêk anî bû û di hevdîtinê de pirsgirêka kurd û çareserî hatibûn nîqaşkirin. **ENQERE**

## Parêzerên Ocalan rastî 'muxalefeta hewayê' hatin

Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bi armanca biçin Girava Îmraliyê hevdîtina hefteyî bi muwekilê xwe Ocalan re pêk bînin hatin Navçeya Gemlîkê. Parêzer, bi hinceta "Muxalefeta hewayê" ji Navçeya Gemlîkê bi paşve hatin vegerandin.

Parêzerên Buroya Hiqûqa Asrin Sebahattîn Kaya, Dogan Erbaş û Şakîr Demîr, bi armanca bi muwekîlê xwe Ocalan re hevdîtina hefteyî ya asayî pêk bîne hatin Navçeya Gemlîkê. Parêzer, piştî çûn Fermandariya Cendirmeyan a Gemlîkê, bi hinceta "Muxalefeta hewayê heye" bi paş ve hatin vegerandin. **BURSA**

## Avahiya BDP'ê rastî êrîşê hat

Avahiya BDP'a navçeya Menemenê ji aliyê kes an jî kesên ku nasnameya wan nediyar ve rastî êrîşê hat. Di encama êrîşê de di avahiyê de zirara madî pêk hat.BDP'a navçeya Menemenê şevê din ji aliyê kes an jî kesên nasnameya nediyar ve rastî êrîşa bi kevir hat. Piştî êrîşê di encama de camên avahiya BDP'ê şikestine, polîsan der barê bûyerê de lêpirsîn da destpêkirin. Serokê Rêxistina BDP'a Îzmîrê Yusuf Kaya, piştî bûyerê hate Menemenê û da zanîn ku di nava selekî de li hemberî partiya wan nêzî 40 êrîşan pêkhatiye. Kaya, anî ziman ku eriş ji ber xemzariya walî û midûrê polîsan pêk tê û xwest berpisyarê van êrîşan bên cezakirin. **ÎZMÎR**

## ÎHD'a Stenbolê der barê gef û heqaretan de gilî kir

ÎHD'a Stenbolê piştî 220 rewşenbîrên ermenî yên di 24'ê nisana 1915'an de hatibûn kuştin li Haydarpaşayê bernameya bibîranînê pêk anî, gelek peyamên gef û heqaret heyî digire. ÎHD'ê ji bo ku berpirsiya bên darizandin serî li Dozgeriya Komarê ya Beyogluyê da.

Endamên ÎHD'a Stenbolê li ber Adliyeya Beyogluyê hatin cem hev û pankarta "Parazvanên mafên mirovan serî li ber heqaret û gefan danaynin" vekirin û daxuyanî dan çapemeniyê. Daxuyanî, Seroka ÎHD'a Stenbolê Gulseren Yolerî xwend. Yolerî, diyar kir ku piştî çalakiya wan di 24'ê nisanê de pêk anîn ji aliyê hinek kesên xirab ve bûn êrîşa gef û neheqiyan. Yolerî, da zanîn ku bi riya telefon û maîlan heqaretan li komeleyan wan tên kirin û wekî hedef tên nîşandan û wiha got: "Rojek berî çalakiyê kesek li komeleya me geriyaye û gelek dûjînên pîs li hevala me ya jin kirine. Heman kesî her wiha gelek heqaret û gefên mirinê li parazvanên mafên mirovan kiriye." Yolerî, anî ziman ku heta niha 22 rêveberên wan hatine qetilkirin û têkoşîna wan gelek tişt derxistine holê bingeha gelek pêşveçûnan amadekiriye. Yolerî, da zanîn ku dê her tim bi biryar têkoşîna xwe bidomînin û serî li hemberî gef û heqaretan danînn. **STENBOL**



## Giliyê 39 BDP'iyan kirin

Midûrê Emniyeta Qersê di derbarê 39 BDP'yî yên ku êrîşa li Semsûnê li hemberî Ahmet Turk pêkhatî protesto kirî de, gilîname pêşkêş kir. Di daxuyaniya ku ji aliyê Midûryeta Emniyetê ve hatî kirin de hat îdiakirin, xwepêşanda protestoyî ya ku di 13 nisanê de ji aliyê Rêveberiya bajêr ya BDP'ê ve li cadeya Faîkbeyê hatî kirin ne rawa ye. Xwepêşandana ku zêdetirî 150 kes tevlî bûyîn hat gotin, " Ji kesên ku tevlî xwepêşandan û meşa ne rawa bûyî, 37 jê zilam û 2 ji wan jin bi tevahî nasnameya 39 kesan hatiye aşkere kirin. **QERS**

www.arsivakurdi.org

## Li Afganistanê 12 mirin

Li bajarê Host a Afganistanê ji ber teqîna bombeya li peravê rê 12 sivîl hatin kuştin. Li ser mijarê Dewlet Xan Yakubiyan diyar kir ku di nav miriyan de jin û zarok jî hene. Dewlet Han Yakubiyan vegot ku piştî teqînê agir bi wesayîtê ketiye û wesayît di nav alavan de ma. Ji ber vê jî kesên di wesayîtê de bûn şewitîn. **QABÎL**

## Li Bexdayê teqîn

Li paytexta Iraq Bexdayê di dema texsiyek derbas dibû de teqîn pêk hat û ji malbatek 4 kes hatin kuşxtin. Polîs diyar kir ku teqîn li herêma Bankayan ya Bexdayê pêk hat. Hat gotin ku bombeya li peravê rê hatî çalikirin dema texsî derbas dibû hatiye teqandin, 4 kes hatine kuştin û 2 kes jî birîndar bûne. **BEXDA**

# Davutoglu Barzanî vexwend Enqereyê

**Musteşarê Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Sînîrlîoglu çû serdana Herêma Federal a Kurdistanê û Mesûd Barzanî bi fermî vexwend Tirkiyeyê. Hat gotin ku Tirkiye pûteyê dide kurdên başûrê Kurdistanê û dixwaze bi awayek hevkarê stratejîk ligel wan tevbigere**



Musteşarê Wezareta Karên Derve ya Tirkiyeyê, Ferîdun Sînîrlîoglu, Serokê Herêma Federal a Kurdistanê, Mesûd Barzanî, vexwend Enqereyê.

Ligel Mesûd Barzanî, Serokwezîr Berhem Salih û Cîgirê Serokê PDK'ê, Nêçîrvan Barzan bi Sînîrlîoglu re li Hewlêrê hevdîtin pêk anîn. Hate ragihandin ku Sînîrlîoglu li ser navê Wezîrê Karên Derve, Ahmet Davutoglu, bi şêweyekî fermî Barzanî vexwend Tirkiyeyê. Hate hînbûn, ku Sînîrlîoglu di hevdîtinê de silavên Serokomar Abdullah Gul û Serokwezîr Recep Tayîp Erdogan jî ragihandiye Barzanî. Hin çavkaniyên nêzî hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê diyar kirin ku Sînîrlîoglu nameyeke ligel xwe aniye û daye Barzanî. Di nameya bi destê Sînîrlîoglu hatî de, hate ragihandin ku hikûmeta Tirkiyeyê pûteyê dide ewlekariya Iraqê û pêwîst e peywendiyên di navbera rêveberiya Herêmê û Tirkiyeyê de wek hevkarên stratejîk werin bipêşvebirin. Hate ragihandin ku di hevdîtina Sînîrlîoglu yê Musteşarê Wezareta Karên Derve ya ligel Barzanî de hatiye vegotin ku rola kurdên li Îraqê girîng e û ew girîngiyeke pirr mezin didine serokatiya Barzanî. Barzanî jî got, ku ew hikûmeta Tirkiyeyê teqdîr dikin, ligel welatên cîran têkiliyên baş datînin û ew di wê baweriyê de ne, heke her du alî jî rast nêzîkî hev bibin dê herêm bikaribe bigihîje asteke baştir. Barzanî vexwendina Tirkiyeyê bi xweşhalî pêşwazî kir, li gotinên xwe zêde kir, ku ew ê serdana xwe di demeke guncaw de bike. HEWLÊR

## Dadgehê got dîmen rast in

Dadgeha leşkerî ya Polonyayê diyar kir ku dimena vîdeoyê ên dema ketina balafira Serokdewletê Polonyayê Kaczynskî û 96 kes tê de miribûn rast e.

Dozgerê Leşkerî yê Polonyayê diyar dike ku dîmenên bi telefonê hatine kişandin rast in. Di dîmenan de du kesên çek li milê wan û kesek ku ji nav balafira ketî dertê, her wiha hewara pîlot a daxwaza alîkariyê dike hene. Dozger diyar dike ku li ser belgeyên herka fira mijarê hûr dibin. Ji 60 kesan îfade girtine. Ancax hê jî nizanin qeza di cih demê de pêk hatiye. Dîmenên ku welatiyê rûs Adrîej Mendîerej bi telefonê kişandiye û dengê çekan di dîmenê de berz dibe. Ev li Polonyayê deng veda. Mijara herî balkêş ew e ku Mandîerej piştî dîmenan di înternetê de diweşîne pir derbas nabe bi kêr ji para ve tê kêrkirin û li nexweşxaneyê dimire. **KÎEV**

## Allavî çav lê ye hikûmeta demî ava bike

Serokwezîrê berê yê Iraqê Îyad Allavî banga avakirina hikûmeta demborî kir. Allavî ku serokê lîsteya Iraqiyeyê ye û di hilbijartina 7'ê adarê de bi ser ketibû li ser rewşê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de banga avakirina hikûmeteke demborî kir û wiha got: "Bi hewldanên dawî hin derdor dixwazin vîna gelê iraqê bidizin." Çavdêr vê daxuyaniyê wek rexneya li daraza Iraqê nirxandin. Dadgeheke Iraqê bo ku têkiliya parlamenterekî lîsteya Iraqiyê bi rejîma Baas re heye parlamenteriya wî betal kiribû. Di hilbijartinê de lîseta Allavî ji 325 parlamenteran 91, Partiya Serokwezîrê Iraqê Nûrî El Malîkî 89 parlamenter der xisti bûn. **BEXDA**

## Êrîvan îmzeya xwe jî vedikişîne

Ermenistanê piştî ku protokolên Ermenistan-Tirkiyeyê rawestand peyameke din da ku ew li gor geşedanên dawî pêkane ku îmzeya Ermenistanê ya di bin protokolan de heye paş ve bikişînin.

Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê Ermenistanê Arman Kîrakosyan bi daxuyaniyek aşkera kir ku Tirkiye mohrkirina protokolan ya bêşert qebûl nake lê bi giştî ji pêvajoyê venakişe. Kîrakosyan venekişîna ji protokolan erênî dinirxîne û vê jî bibîr dixe. Hilbijêrka me ya ku Ermenistan dê îmzeya xwe ji bin protokolan paşve vekişîne jî heye. Hat gotin ku guherîna polîtîkayê ya wan li gor geşedanên ku pêk bên reng û teşe bigire.

Her wiha Ermenistan ligel ku protokolan rawestandiye jî li baweriya xwe pê heye ku bazirganiya nav Tirkiye û Ermenistanê dê li pêş bikeve û Tirkiye ceryan bifroşe Ermenistanê. Serokomarê Ermenistanê Sarj Sarkîsyan di civîna Konseya Enerjiya Atomê ya Ermenistanê de axivî. Di axaftina Sarkîsyan de tê diyarkirin ku heke deriyê sînor ê Tirkiye-Ermenistanê ve be dê lezî bide hevkariya enerjiyê ya herêmê.

Sarkisyan aşkera dike ku pêvajo ji ber nelebatiya Tirkiyeyê rewestiyaye. Sarkîsyan dibêje ku ew potansiyela ceryanê ya Tirkiyeyê dibînin. Ancax baldikişîne ser aloziya ku di herka pêvajoya protokolan de derketiye holê. Protokol bi serdana Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul li ser enerjiyê pêş ketibû û roja 10'ê cotmeha 2009'an li Zurîhê di nav her du welatan de hatibû mohrkirin. Wezîrê Enerjiyê yê Ermenistan Armen Movsîsyan jî aşkera kiribû ku protokola enerjiyê ya ku di meha cotmeha borî de her du welatan mohr kiribû ji ber pirsgirêkên Tirkiyeyê yên siyasî neketiye meriyetê. **ERÎVAN**

## NY'yê Fransa kir marqajê

10 pisporên Komîteya Têkoşîna Dijberiya Îşkenceyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) li Fransayê derbarê rewşa mafên mirovan de pirs ji rayedarên fransi kirin. Sefîrê Fransayê yê NY'ê Jean-Baptîste Matteî li ser rewşa mafê mirovan a Fransayê raporek pêşkêşî NY'yê kir. Di raporê de tê aşkerakirin ku li Fransayê der barê mafên mirovan de hin tengasî tên jiyîn.

Matteî di raporê de pesnê Fransayê dide. Vedibêje ku Fransayê ji sala 2005'an û şûn ve di qada mafên mirovan de pêşketinên girînk pêk anîne.

Ji pisporan Dadgerê Fasî Essadîra Belmîr bal dikişîne ser daraza Fransayê û wiha dibêje: "Li Fransayê enflasyona qanûnan tê jiyîn." Belmîr aşkera dike ku li Fransayê her ku bûyerek rû dide ji bo wî qanûnek tê derxistin. Belmîr dide zanîn ku ev qanûnên ku li ser navê ewlehiyê hatine derxistin di jiyanê de dor li mafê mirovan dipêçe.

Di nav pisporan û nûneren fransî de hevdîtin hatin kirin. Di hevdîtinan de pisporan dan zanîn ku girtîgehên Fransayê ji sedî 110,9 ji kapasîteya xwe pirtir dagirtîne. Di hevdîtinan de întîhar û aletên ceryanê yên polîs bikar tînin û dibin sedemê felcê girtin dest.

Pispor didin zanîn ku carna ev alet dibin sedêmê felcê û mirinê. 16 nûnerên fransî duh bersiv dan pirsên pisporan û pispor jî dê li servan bersiva pirsên ku hê nehatine aşkerakirin dê şîret û peşniyarên xwe li Fransayê bikin. **CENEVRE**

## HRW: Îşkence rûtîn pêk tên

Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan (HRW) got ku li girtîgeha Muthannayê di nav girtiyan de îşkence rûtîn bikar tê.

HRW ya ku navenda xwe li New Yorkê ye aşkera dike ku piştî derket holê li balafirgeha Muthanna ya berê girtîgeheke nepenî heye dest bi lêkolînê kirine. Rêxistin derbarê lêkolînê de rapor amade dike. Tê aşkerakirin ku li hefteyên borî ji girtîgehan nepenî 300 girtî diguhêzînîn navenda binçavê ya El Rusafayê. Rêxistin ji wan 40 kesan re hevdîtin dike. Rapor li ser van hevdîtinan tê amadekirin. Tê gotin ku bi çavdêriyê jî mirov dibîne ku li girtiyan îşkence hatiye kirin. Di raporê de tê aşkerakirin ku girtiyên ku bi boneya 'terorê' hatine girtin bê hewa tên hiştin, li wan didin, ceriyan didin wan, ji nigan ve serbijêr bidarve dikin, tacîza cinsî û tecawiz li wan tê kirin. Dîrektorê Rêxistinê yê Rojhilata Navîn Joe Stork dibêje ku hovîtiya ku ew bi lêkolînê bûne şahidê wê di girtîgeha Muthannayê bi awayekî rûtîn pêk tê. **NEW YORK**

## Hrîstofyas: Dewleta kur bi ser ket

Serokomarê Kibrisê Dîmîtrîs Hrîstofyas di hilbijartina Kibrisa Bakur de têkçûna Mehmet Alî Talat wek serkeftina 'Dewleta Kur ya Tirk' ya li dij Erdogan destnîşan kir. Hat gotin ku yekemîn care ku Erdogan li Kibrisê li dij dewleta kur têk diçe.

Rojnameya Fîlelefetheros ku li Kibrisê weşanê dike li ser mijarê agahî daye. Tê gotin ku Enqere bo ku pêşî li serkeftina Dervîş Eroglu bigire nûnerên welatiyên kibrisê birine Enqereyê û ji wan xwestine piştgiriya Talat bikin.

Di agahiyê de tê gotin ku Talat ji ber polîtîkayên peritî yê hikûmeta CTP'ê, sekana wî ya a sosyal ya ji gel dur, mijûliya bi pirsgirêkên navxweyî bûne sedemê têkçûnê. Hrîstofyas destnîşan dike ku her dem polîtîkayên Kibrisê ji aliyê Tirkiyeyê ve tê diyarkirin.

Hrîstofyas vedibêje ku piştî Eroglu desthilatiyê bi dest xist mafê welatîbûnê daye hezar û 400 welatiyên Tirkiyeyê.

Rojnameya Fîlelefetheros cih dide nirxandine Serokomarê Kibrisê Hrîstofyas jî. Hrîstofyas aşkera dike ku têkçûna Talat serkeftina dewleta kur ya tirk a li dijberî Serokdewletê Tirkiyeyê Erdogan e.

Rojnameya Polîtîs jî vedibêje ku Hrîstofyas di polîtîka Tirkiyeyê de guherînek rû bide dê ew jî li henberê vê guherînê lezgîn tevnegere û ancax tişta ku rûbidin jî dê bi baldarî binirxînin û li gorî vê bi awayekî kamil biryarên xwe bidin. **LEFKOŞE**



Mehmet Alî Talat — Dimîtrîs Hrîstofyas

*Sererastkirin:* Duh di Spasiya malbata Polatan de Şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu wek şaredarê Sûrê derbas dibû. Em ji xwendevanên xwe lêborîn dixwazin.



# Kîm Phuc ‘Bextewariya Zêrîn’

Adil ZOZANÎ / AMED

Yên di dîrokê de zilm kiriye, cihê xwe di rûpelên reş ên dîrokê de girtine. Lê yên rastî zilmê hatîn, heke derfetê jiyanê jê re mabe bûne, ji bo ku zilmkar ji zilma xwe fêdî bikin bûne abîdeyên jiyaneke bi rûmet.

Kîm Phuc, ango Phaen Thî Kîm Phuc yek ji wan kesan e ku zilmdar ji ber zilma kiriye dane şermê. Ji bo ku baştir bê fêmkirin bêjim; Kîm Phuc ew keçika vîetnamî ya ku ji ber bombeyên napalmê yên Amerîkayê di reviya. Û reva wê ya li ber deklanşora fotokêş Nick Ut bûye sembola zilma Amarîkayê ya li Vîetnamê.

Kîm Phuc di sala 1963’yan de li gundekî bakurê Saygona Vîetnamê hatiye dinyayê. Navê wê tê wateya ‘Bextewariya Zêrîn’. Kîm Phuc hema bêje di nava şer de hatiye dinyayê. Di zarokatiya wê de welatê wê ji aliyê Amerîkayê ve hate dagirkirin. Zilmeke ku heta wê rojê kêm mînakên wê hatiye jiyîn li ser welatê wê hate barandin.

Di encama şerê deh salan de zilm û zordestiyeke wisa li Vîetnamê hate meşandin ku îro mirovahî vê zilmê wekî rûpelekî reş ê dîrokê bi nav dike.

Di vê şerê ku hemû sînorên mirovahiyê hatine bezandin de biçûk û mezin, hemû vîetnamî ji bo Amerîkayê bûn hedef. Li her derê qetl û xwîn bû. Gundê Kîm Phuca 9 salî jî di sala 1972’yan de ket ber hedefa leşkerên amerîkî. Balafirên Amerîkayê bombeyên Napalmê li ser gundê Kîm Phucê jî barandin.



**Ji pêlên agir rizgar bûn**

Kîm Phuc ligel çend zarokên din ji pêlên agirê Napalman nîvşewitî ‘rizgar’ bûn. Dema pêlên agir ji bedana Kîm Phucê bilind dibû; wê bi qîrîneke ku ji bo mirovahiya ‘wijdankor’ hewara xwe radigihand. Nick Ut, qîrîna Kîm Phucê ji mirovahiya ‘wijdankor’ re ragihand. Û ew fotoyê ku ji bo Nick Ut bûye ‘Xelatê Pulitzer’ êş û jana civakekê vedigot.

Nick Utê ku li Vîetnamê 3 caran bûye hedef û birîndar bûyî der barê wê kareyê de van agahiyan dide: “Kîm, pir nebaş dixuya, min got dê bimire. Wê rojê min gelek foto kişandibûn û ez ê ji navçeyê vegeriyabûma. Tam di vê navberê de min du balafir dîtin. Her yekê ji wan 4 bombeyên napalmê berdan ser navçeyê. Di navbera 3-4 deqeyan de qîrîn û hewara mirovan bilind bû. Kîm çawa ez dîtim bi zimanê vîetnamî bangî min kir û av xwest. Min hinik av dayê. Jê re got, ‘ez ê alîkariya te bikim’. Li wesayîta xwe suwar kir û bir nexweşxaneyeke ku 15 kîlometreyan dûrî navçeyê bû. Nexweşxane ji birîndar û miriyan û leşkeran tijî bû. Çu kes bi zarokan re eleqedar nedibû. Min got ku ez rojnameger im. Ji bo ku Kîm nemire qîriyam. Alîkarî dan min.”

> Hem mexdûr û hem jî sembola şerê Vîetnamê ye Kîm Phuc. Mîrov bêje, ‘sembola wehşeta li hemberî vîetnamiyan hatiye meşandin e’, gotin di cih de ye. Û di heman demê de bûye sedem ku zilmkar ji zilma xwe fêdî bikin

**Bawer nedikirin bijî**

Kîm Phuc piştî 14 mehan ji nexweşxaneyê derket. Ji nîvê zêdetir bedena wê bigiranî şewitîbû. Doktoran bawer nedikir ku ew ê bijî. Lê Kîm Phucê li ber xwe da. Bedena xwe ya bûye sembola kirinên dermirovahiyê yên Amerîkayê vejiyand. Piştî du salan vegeriya gundê.

10 salan şûnde, di sala 1982’yê de fotokêşekî holandî ji hikûmeta Vîetnamê xwest ku ‘keçika ku wêneyê wê bûye sembola wêraniya Vîetnamê’ peyde bike. Wê demê Kîm Phucê ji bo ku bibe doxtor perwerde dibû. Lê ji ber eleqeya mezin a çapemeniyê li ser daxwaza hikûmetê perwerdehiya xwe nîvco hişt. Piştî 4 salan di çavdêriya hikûmetê de çû Kubayê û perwerdehiya xwe ya nîvço mayî xwest ku li vir temam bike. Lê vê carê jî pirsgirêkên tenduristiyê rê neda ku perwerdehiya xwe temam bike. .



Di sala 1992’ê de li Buî Huy Toan re zewicî. Di sala 2003’ê de dema balafira ku ew û hevserê wê jî lê siwarbûn li balafirgeha Gander a Newfoundlandê ji bo ku sotemeniyê bigire dadayî, xwest ku li Kanadayê bibe penaber.

Ji vê demê şûnde li Kanadayê dijî. Kîm Phuca ango ‘Bextewariya Zêrîn’ ji bo mexdûrên şer mîsyona peyamgeriya aştiyê da ser xwe. Ji sala 1994’ê virde ye ji bo UNESO’yê sefîrtiya niyeta baş dike. Di Weqfa Kîm a di sala 1977’an de li Chicagoyê de ji bo zarokên mexdûrên şer xizmetê daye ber xwe.




# ‘Çanda tecawizê tê rewakirin’

Jinên ku bi banga Konseya Jinan a Bajar ên BDP’a Colemêrgê hatin ba hev, tacîz û tecawizên li dijî zarokan ên Sêrtê ku di demên dawî de derketin holê, şermezar kirin. Meclîsên Jinan ên BDP'a Bedlîs û Tetwanê jî, bûyera tecawizê ya li Sêrtê û bûyera tacizikirinê ya li li Amedê, bi daxuyaniyekî şermezar kir.

Jinên ku beşdarî çalakiyê bûn li ber avahiya BDP’a Colemêrgê hatin cem hev. Jinan dowîzên weke “bila tacîz û tecawiz bi dawî bibin”, “hûn dikarin bedana me li erdê kaş bikin lê hûn nikarin îradeya me teslîm bigirin” rakirin û dirûşmên “jin, jiyan, azadî”, “AKP a tacîzkar dê hesab bide”, “Bijî Serok Apo” berz kirin. Jin heta Şaredariya Colemêrgê bi meşaleyan meşiyan. Cîgira Şaredarê Colemêrgê Hatîce Demîr, Hevseroka BDP’a Colemêrgê Emîne Akboga, ÎHD, KESK, Însiyatîfa Dayikên Aştiyê jî di nav de bi hezaran jin beşdarî çalakiyê bûn.

Cîgira Şaredarê Colemêrgê Hatîce Demîr daxuyanî xwend û got ku hêzên serdest û dewletparêz di mejiyê mirovan de çanda tecawiz û tacîzê rewa dikin. Demîr wiha axivî: “Di roja îroyîn de tacîza li dijî jinan, di fuhuşê de bikaranîna jinan weke ku pêkanînên rewa yên desthilatdariyê tê nîşan dan. Bi vê nêzkatiyê civakê tê bêîradekirin û şexsiyet tê parçekirin û tê teslîmgirtin. Kesên ku beriya demeke bi raporê Saziya Tiba Edlî xwestin Huseyîn Uzmek pak nîşan bidin niha jî kesên ku li Sêrtê tecawizî jinan kirine diparêzin. Ev yek hevkariya şîdeta zilam û dewletê ye.”

Demîr bal kişand li ser bûyera tacîzê ya polîsan a li Amedê ya li dijî jineke BDP’î jî û wiha got: “Di rojên borî li Amedê hevala me ya bi navê D.A. rastî tacîza polîsên sivîl hat. Piştî vê bûyerê jî li Sêrtê zarokê dibistana seretayî rastî tecawizê hatine. Ji ber ku di nava bûyerê de polîs û mamoste jî di nav de gelek kes hene ev yek me dixe fikaran.”

Demîr got ku piştî bûyerê Serokwezîr Erdogan, Wezîr Aliye Kavaf û Nîmet Çubukçu gotine ku çapemenî vê bûyerê mezin dike. Ji ber vê yekê jî divê Erdogan, Kavaf û Çubukçu îstîfa bikin.

Meclîsên jinê yên BDP'ê yên Bedlîs û Tetwanê jî bûyera tecavizê ya li Sêrtê ku 2 jê xwîşk 7 keç rastî tecawiz hatibûn û bûyera tacîzê ya li Amedê ku jinek endama DOKH'ê ji aliyê kesên sivil ve hatibû tacîzkirin bi daxuyaniyekî şermezar kir. Beriya daxuyaniya jinan ji ber avahiya Rêxistina BDP'ê ya Tetwanê heta Naveda Kar a Jiyanê ya Tetwanê meşek lidarxistin. BDP, KESK û KURDÎ DER'ê jî di meşê de piştgirî da jinan. Jinan di meşê de pankarta "Hûn nikarin bi girtin, tecaviz û tacizan me bêzar bikin." vekirin û sloganên wekî "Destên dirêjî jinê dibin, bila bişkên" "Mêr lê dixe dewlet di parêze" hatin berz kirin. Piştî meşê Berdevka Meclîsa Jinê ya BDP'ê Dilgeş Akdenîz axaftinek kir û gotinên Waliyê Sêrtê yên wekî "Cihê çalakiyê bila fihuşê bikin" bibîranî. Akdenîz, ji ber vê gotinê walî şermezar kir û xwest berbisyarê van tacîz û tecawizan bên cezakirin. **COLEMÊRG / BEDLÎS**

# ‘Divê tifaqa jinan bê xurtkirin’

Gulistan AKSOY / Çîmen GUMUŞ - AMED / DÎHA

Beşdarvana Konferansa Jinan a li Amedê Derhênera rojhilatî Şîrîn Cîhanî, diyar kir ku lazim e organîzasyonên jinên kurd binin cem hev û yekitiya wan xurt bike dom bikin.

Derhêner Şîrîn Cîhanî piştî beşdarî Konferansa Jinên Kurd a bi dirûşmeya "Di pêşxistina demokrasiyê de rista jinan" a ji aliyê Tevgera Jinên Azad û Demokratîk ve hate organîzekirin bû têkildarî konferansê û pirsgirêkên jinên kurd ên li rojhilat nerînên xwe anîn ziman. Cîhanî, ji bo domandina xebatên xwe neçar ma ji Îranê biçe Iraqê, niha li wir xebatên xwe yên hunerî dimeşîne. Cîhanî, têkildarî konferansê diyar kir ku jinên kurd ên ji Îran, Iraq Sûriye û Tirkiyeyê li Amedê kom bûn pirsgirêkên xwe parvekirin û ji bo wê li çareseriyê geriyan.

Cîhanî, da zanîn ku di konferansê de li ser pirsgirêkên jinê rawestiyane û wiha got: "Me pirsgirêkên jinên kurdistanî ên wekî şîdet, binpêkirinên mafan, pirsgirêkên demokrasiyê niqaş kir. Bi taybetî li Kurdistana Rojhilat pirsgirêkên mezin ên jinên kurd hene. Lê li gel pirsgirêkên heyî dîsa jinên kurd li qadên çandî, hunerî, siyasî û civakî têkoşînên gelekî girîng didin." Cîhanî, balkişand ser giringiya hevparkirina pirsgirêkên jinên kurd û da zanîn ku nîqaşên di platformek wiha de gelekî girîng in.

**Têkoşîna hevpar girîng e**

Cîhanî, balkişand ser giringiya têkoşîna hevpar û wiha dirêjayî da axaftina xwe: "Lazim e li ser van esasan li hemberî pirsgirêkên tên jiyîn têkoşîna me di nava yekîtiyekê debe. Ji gelekî bajarên Kurdistanê jin beşdarî vê konferansê bûne. Ev konferans a yekem e. Lê divê nebe ya dawî. Ji bo vê yekê jî peywirên gelekî girîng dikevin ser milên me hemûyan. Dîsa organizasyonên berdewamiya vê konferansê bikin divên." Cîhanî, destnîşan kir ku di konferansê de tesbîta gelek pirsgirêkan kirine û di tespîtan de diyar bûye ku şîdeta li hemberî jinê pir alî tê meşandin û wiha got: "Li aliyekî şîdeta dewletê, li aliyê din jî şîdete zilam heye. Jin ji ji ber kevneşopiyên civakê pirsgirêkên xwe parve nakin ev yek dibe sedema qeyranê."

Cîhanî, bal kişand ser pirsgirêkên jinên li Îranê û wiha axivî: "Bi taybetî jinên li rojhilatê Kurdistanê rastî pirsgirêkên bi vî rengî tên. Lê li hemberî van zor û zahmetiyan jî têkoşînên jinan û destkeftiyên wan jî tên dîtin. Ev yek jî xwe di qadên siyasî, çandî û civakî de nîşan didin. Dîsa di qadên zanistî û akademîk de jî xebatên girîng ên jinan tên dîtin." Cîhanî, xwest ast û rêjeya jinên kurd a di qadên civakî de bên bilindtirkirin. Cîhanî, balkişard ser aliyekî mezin ê jinan û bi taybetî yên jinên kurd hema hema her roj rastî êrîşan tên. Cîhanî, xwest jinên kurd rêxistina xwe û yekîtiya xwe xurd bikin.



**Heman pirsgirêkan dijîn**

Derhêner Cîhanî, der barê pirsgirêkên jinên li Îranê dijîn ên fars, azerî û beluciyan de jî da zanîn ku jinên ji hemû neteweyan rastî heman pêkutî û cureyên şîdetê tên.

Derhêner Cîhanî, bi bîr xist ku li Îranê jin bi taybetî giraniyê didin xebatên çand û hunerî û di vê qadê de jî gelekî berheman diafirînin. Her wiha Cîhanî got ku îro têkoşîna jinên kurd gihiştiye astek wadetar.

# Rewşa girtiyên nexweş wekî mînak: Demîrbaş

**Li Tirkiyeyê, li gel hemû bang û nezarîbûnên têkildarî rewşa girtiyên nexweş, bêdengiya rayedarên hikûmetê ya li hemberî van girtiyan didome û dem bi dem dibe sedema mirina girtiyên nexweş**

RIZOYÊ XERZÎ

Her kesê ku rojev û siyaseta Tirkiyeyê dişopîne baş dizane ku sedema girtina şaredar û siyasetmedarên kurd yên di encama girtinên bi navê operasyona KCK'ê de ji bo çi hatin girtin. Dema ku mirov bala xwe bide xebatên van kesên ku hatine girtin jî ew yek hêj baş tê fêmkirin. Kesên ku di van operasyonan de hatine girtin tevan bi rengekî çalak pêşî li lîstikên AKP'ê yên ji bo hilbijartinên Adara 2009'an girtine û ew siyaseta wê têk birine.

Şaredariyên wekî Batman, Sûra Amedê, Peyas û Sêrtê ku AKP'ê bi hemû hêz û îmkanên dewletê û alîkariya partiyên din xwest ku ji destê kurdan derxîne bi ser neket û bi xebata van hevalan em bi têkçûnekî mezin re rû bi rû hiştin. Lewra jî hikûmeta AKP'ê tiştê ku nikaribû bi riya hilbijartinan bike, vê carê berê xwe da tolhildanê bi riyên dadgeh û dozgerên xwe, bi riya çewisandin û girtina kurdan xwest ku tola xwe hilde.

Yek ji wan kesên ku şev û rojên xwe kiribû yek bê navber xebatên hilbijartinan dimeşand şaredarê Sûra Amedê Abdullah Demîrbaş bû. Demîrbaş berê jî ji ber projeya xwe ya pir zimanî ku xwestibû di şaredariyê de ji bilî zimanê tirkî bi zimanên din jî xizmetên şaredariyê bike ji wezîfeyê hatibû girtin. Demîrbaş ji ber kar û xebatên bi zimanê kurdî û xebatên di dema hilbijartinan de dîsa hate girtin û tevî ku nexweşiya wî girane ji bi rengekî girtî tê dermankirin.

**Li Fakulteya Tipê anjiyo bû**

Pirsgirêkên tenduristiyê yên Şaredarê Navçeya Sûrê ya Amedê Abdullah Demîrbaş ku di 24'ê kanûna 2009'an de di çarçoveya operasyona KCK'ê de hat girtin, didomin. Demîrbaş, beriya mehekê, ji ber pirsgirêkên tenduristiyê ji girtîgehê biribûn nexweşxaneyê.

Demîrbaş, bi nexweşiya Tromboza Venê ya Kûr ketibû û ji ber vê yekê jî damarên wî dixitimîn.

Damarên lingê Demîrbaş ên dixitimin, bandora xwe didin dilê wî jî. Bijîşk, ji bo wî rapor amade kirine û gotine ku 'Rîska wî ya mirinê zêde ye. Li ser vê yekê jî parêzerên Demîrbaş, ji bo tahliyekirina wî serî li meqamên têkildar dane. Lê serlêdanên wan ne hatin qebûlkirin. Pisporan di rapora xwe de gotibûn ku divê Demîrbaş ji aliyê pisporan ve, ji nêzîk ve bê şopandin û dermankirin.

Tevî hemû bangên rêxistinên mafên mirovan yên ji bo serbestberdana girtiyên nexweş û dermankirina wan hikûmetê guhên xwe girtine û bi xemsarî nêzî vê rewşê dibe. Dem bi dem girtiyên nexweş jiyana xwe ji dest didin lê hikûmeta AKP'ê xwe bi van bûyeran nahisîne û guhê xwe kirine teht. Ji bo pêşîgirtina li vê bêdadiletiyê pêwîst e ku Demîrbaş û hemû girtiyên nexweş ên din jî bên serbestberdan da ku bikaribin bi serbestî dermankirina xwe bikin.

**Kampanyaya CHAK'ê**

Navenda Kurdocide Watch-CHAK ê di gel Kurdocide Watch CHAK-Bakur ji 30'yê adarê hetanî niha kampanyayek navneteweyî bi alîkarî û hevkariya gelek dezgehên neteweyî ji azadikirina Abdullah Demîrbaş daye destpêkirin. Xebata wan a ji bo azadiya Demîrbaş didome.

**Banga ÎHD'ê**

Şaxa ÎHD'aa Wanê diyar kir ku di rojên dawî de girtiyên Girtîgeha Tipa F a Wanê bi riya nameyan serî li wan dane û bal kişandine ser pêkutiyên dijberî xwe. ÎHD'ê bang li Wezîrê Dadê kir û xwest ji bo girtiyên nexweş bikeve nava hewldanê.

Şaxa ÎHD'a Wanê der barê şert û mercên girtiyên nexweş de li avahiya xwe civîna çapemeniyê pêk anî. Di civînê de birayên girti Emrah Abî,





Osman Yîgît

Mehmet Abî û Gokhan Abî jî amade bûn. Li ser navê ÎHD'ê reveberê ÎHD'ê Hamd Bayhan daxûyanî xwend. Bayhan diyar kir ku girtiyên bi navê M. Emîn Akbag û Emrah Abî li Girtîgeha Tîpa F a Wanê rastî pêkaninên ne baş hatine. Bayhan, da zanîn ku li gel rapora Lijneya 3'yemîn ya girêdayî Lijneya Tipa Adlî ya Stenbolê ku tê de hatibû ragihandin 'xetereya jiyana' Akbag heye jî hem li aliyê rêveberiya girtîgehê ve hem jî ji aliyê saziyên tenduristî ve rastî pêkanînên neyînî hatiye. Bayhan, 'ji bilî Akbag malbata girtiyê bi navê Emrah Abî jî serî li wan daye û got ku kurê wan nexweşê dil e, rapora wî ya desteya tenduristî heye lê rêveberiya girtîgehê bê hincet dermanên wî nedayinê û Abî ji ber vê sedemê rakirine Nexweşxaneya Yuksek Îhtîsas a Wanê."

Bayhan, daxuyand ku ew dê serlêdanan bişopînin û bang li Wezîrê Dadê û Miduriyeta Girtîgeha Tîpa F a Wanê kir ku ji bo nexweşên girtî bikeve nava hewildanan.

## Her roj 55 heban didin girtiyê nexweş

Li Girtîgeha Tîpa F a Tekîrdagê, girtiyên bi navê Yilmaz Ayyildiz, Gulnaz Akkurt û Yusuf Dag ku pirsgirêkên cidî yên tenduristiyê dijîn di heman hûcreyê de tên girtin. Hate ragihandin ku girtî nikarin hewcedariyên xwe yên rojane bibersivînin.

Nameya ji 2'yemîn Girtîgeha Tîpa F a Tekîrdagê ji bo DÎHA'yê hatiye şandin de hate diyarkirin ku girtiyên pirsgirêkên wan ên tendurîstiyê yên giran hene yên bi navê Yilmaz Ayyildiz, Gulnaz Akkurt û Yusuf Dag di heman hucreyê de tên girtin. Her 3 girtiyên navborî jî nikarin bi tena serê xwe hewcedariyên xwe yên rojane bibersivînin. Di nameya ji aliyê girtiyê bi navê Adet Tîryakî ve hatiye şandin de tê destnîşankirin ku divê Yilmaz Ayyildiz ji bo anjo bibe bibin Nexweşxaneya Lêkolînê ya Edirneyê, lê ev yek nayê kirin. Di nameyê de wiha hate gotin: "Rayedarên nexweşxaneyê ji hevalê me re ragihand ku 'di laşê wî de xwîn tune ye, kolesterol heye'. Ligel vê yekê jî anjiyo nekirine û hevalê me careke din paş ve şandine girtîgehê. Gelek nerehetiyên Ayyildiz ên tendurîstiyê hene. Nexweşiya şekirê ya nepenî, nexweşiya dil a domdar, prostat, nexweşiya kezebê (KOAH), nexweşiya gurçikê û nexweşiya pişê ya berê hatibû emeliyatkirin didome. Ji bo ev nexweşî bên dermankirin, divê morala hevalê me baş be. Lê rojane hevalê me 55 dermanan dixwe.

**'Guhertina hucreyan tê redkirin'**

Tiryakî, anî ziman ku Ayyildiz hatiye rewşeke wisa ku nikare hewcehiyên xwe yên rojane pêk bîne û wiha pê de çû: "Daxwazên ji bo guhertina hûcreyê her tim tên redkirin û li gel vê yekê jî hevalê bi navê Gulnaz Akkurt ê herdu çavên wî nabînîn, birin cem wî. Her wiha gelek pirsgirêkên girtiyê nû Yusuf Dag jî hene."

Tiryakî, daxuyand ku ji ber di hucearaya wan de sarinc tune ye nikarin tiştên wekî; mast, şîr, fêkî û xwarinên din ên di bernameya diyetê de hene ji xwe re bînin û lewra hemû xwarinên wan xirab dibin. Tîryakî, da zanîn ku daxwaz hevalên wan a ku biçin hûcreyên sarinc lê heye jî her tim tê redkirin.

**Nexweşeke din jiyana xwe ji dest da**

Li Tirkiyeyê, li gel hemû bang û nezarîbûnên têkildarî rewşa girtiyên nexweş, bêdengiya rayedarên hikûmetê ya li hemberî van girtiyan, dîsa bû sedema mirineke nû. Reveberê DTP'a girtî yê bi navê Osman Yîgît ku nexweşê dil bû jiyana xwe ji dest da. Derket holê ku dozgeriyê hêj îdianameya der barê Yîgît de amade nekiriye.

Piştî mirina Hesabgirê Rêxistina DTP'ê ku hatiye girtin yê Navçeya Toroslara Mêrsînê Osman Yîgîtê (34) nexweşê dil û 6 meh beriya niha di çarçoveya "Operasyona KCK'ê" de hatibû girtin û li Girtîgeha Tîpa E ya Mêrsînê dihat girtin, ihmalkariyeke mezin a girtîgehê derket holê. Hate hînbûn ku Yîgîtê ku bi neçarî di sala 1988'an de ji navçeya Êlkê ya Şirnexê koçî Mêrsînê kiribû, dema temenê wî biçûk bû ji dilê xwe emeliyat bûbû û neçar bû ku bi awayekî sîstematîk derman xwariban.

**'Divê bi rêk hatibûya dermankirin'**

Derket holê ku Yîgît, bi raporên xwe serî li rayedaran daye û dîsa nehatiye dermankirin. Yîgît, 6 rojan beriya niha ji bo dermankirinê rakiribûn Nexweşxaneya Balcaliya Fakulteya Tibê ya Zanîngeha Çukurovayê û ew li vir emeliyat bûbû. Piştî emeliyatê Yîgît rakirin beşa lezgînî û wî di saet 09.00'an de jiyana xwe ji dest da.

**Îdianameya wî nehatibû amadekirin**

Li gel ku ev 6 meh in Yîgît hatiye girtin jî hêj dozgeriyê der barê wî de îdianame amade nekiribû. Çav li rê ye ku malbata Yîgît cenaze ji bo definkirinê bibe Mêrsînê.

**Mirina bi guman a Kilinç**

Hate diyar kirin, girtiyê binavê Mehmet Kilinç ê hate îdiakirin ku di Girtîgeha Tîpa F a Kiriklara Bucayê de teşebûsê întîharê kiriye, li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Hate zanîn ku ev xwîn çûye mejiyê Kilinç û jiyana xwe ji dest daye.

Rapora otopsiyê ya der barê hikûmxwar Mehmet Kilinç, ku bi îdiaya di Girtîgeha Tîpa F ya Kiriklara Bucayê de teşebûsê întîharê kiriye, rakiribûn nexweşxaneyê û li vir jiyana xwe ji dest da aşkera bû. Li gorî encama otopsiya Kilinç, di encama xwînbûna meşû ya giredayî travmaya bi tund jiyana xwa ji dest daye.

Di rapora otopsiyê de ev agahî tên dayîn: "Di serê kesê mirî de, ji eniyê heta, patikê wekî şeridek mezin morahî hatine tespîtkirin. Li gel gelek deverên laşê wî, di bin çoka wî ya rastê, zend, piyê wî û boçika wî de çixêz û reşbûn hene." Di rapora ku ji rapora nexweşxaneyê cudatir agahiyan dide de, tê gotin ku di ser meşîkokê wî de xwînbûyîn û di meşî de jî zirar pêk hatiye.

**Bîlançoya girtîgehan a 2009'an**

Serokê Giştî yê ÎHD'ê Oztuk Turkdogan, bîlançoya girtegehên Tirkiyeyê ya 2009'an aşkera kir û got ku li gorî sala 2008'an di girtinan de zêdebûnek heye. Turkdogan, diyar kir ku di sala 2009'an de di girtîgehan de 24 kes mirine û 49 kes jî li gel nexweşên giran in nehatin berdan û wiha axivî: "Dîsa me der barê Girtîgeha Îmraliyê de jî serlêdan kirin. Lê ew jî nehatin bersivandin." Turkdogan bal kişand ku divê Peymana Li Dijî Îşkenceyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) ji aliyê Parlamentoya Tirkiyeyê ve bê qebûlkirin.

Navenda Giştî ya ÎHD'ê der barê pirsgirêkên ku di navbera 1'ê çileyê û 31'ê kanûna 2009'an de li girtîgehan hatine jiyîn, raporek amade kir. Serokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan û Sekretera Giştî Sevim Salihoglu têkildarî mijarê li navenda komaleyê civîneke çapemeniyê pêk anî. Di civînê de rapor hat aşkerakirin. Li gorî raporê, di sala 2009'an de li girtîgehan 24 kes mirine û 49 kes jî li gel nexweşên giran in, nehatin berdan.

Dîsa li gorî raporê, îşkence û muameleyên ne baş ên girtîgehan li gorî sala 2008'an zêdetir bûne. Di nav van binpêkirina mafên astengkirina mafê hevdîtinê jî heye. Di sala 2008'an de 103 hezar û 235 kes di girtîgehan de bûn lê ev hejmar di sala 2009'an de derketiye 118 hezaran.

**2 hezar û 544 zarok girtî ne**

Dîsa li gorî rapora ÎHD'ê di girtîgehan de 2 hezar û 544 girtî ne û 245 zarok jî hikûmxwar in. Turkdogan da zanîn ku ev hejmar bixwe jî binpêkirineke mezintirîn e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Divê kontrolkirina rewşa girtiyên nexweş jî ne di destê Saziya Tipa Edlî de be. Divê ev rayeyê jî bidin Nexweşxaneyên Lêkolîn û Perwerdehiyê. Ev jî dê sûdeyek bide çareseriya pirsgirêka girtiyên nexweş. Dîsa divê serokomar jî dema rayeya xwe ya efûkirinê bi kar tîne, li gorî raporên Tipa Edlî tevnegere."

**'Divê meclîs protokolê qebûl bike'**

Ozturk Turkdogan bal kişand ku binpêkirinên mafan ên li girtîgehan bi awayeke awarte zêdebûne û wiha pê de çû: "Divê hikûmet di vê mijarê de hin tedbîran bigire. Berî her tiştî jî divê Protokola Peymana Li Dijî Îşkenceyê ya NY'ê bê qebûlkirin. Divê li Tirkiyeyê li dijî îşkenceyê mekanîzmayeke bê avakirin. Divê hikûmet pêşî li lêkolînên rêxistinên sivîl ên civakî veke."

# 'Aştî dê bi hunerê bê Cûdiyê'

3'yemîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Silopiyê ku ji aliyê Şaredariya Silopiyê ve tê organîzekirin dê bi slogana "Aştî dê bi hunerê bê Cûdiyê" dê 30'yê nîsanê dest pê bike û 3 rojan bidome. Şaredariya Silopiyê, 3'yemîn Mîhrîcana Çand û Hunerê ya Silopiyê dê di navbera 30'yê nîsanê û 2'yê gulanê de li dar dixe. Di mîhrîcana ku dê bi slogana "Aştî dê bi hunerê bê Cûdiyê" pêk tê de dê li ser mijarên jin û aştiyê bê sekinîn û bernameyên wekî şano, pêşengeh, konser, panel, hevpeyvîn û çalakiyên hunerê yên din dê bên pêşkeşkirin. Şaredarê Silopiyê Emîn Togrul der barê mîhrîcanê de agahî da û diyar kir dê li ser Çiyayê Cûdiyê, li ser axa pîroz mîhrîcanê pîroz bikin û ji hemû herêmê re banga tevlibûnê kir. **(ŞIRNEX / DÎHA)**

**Bernameya Mîhrîcanê**


**30 nîsan În**
Meşa Destpêka Mîhrîcanê: Ji ber Şaredariyê heta Kolana Hunerê
Vekirina pêşengehê: Zarokên maxdûrên TMK'ê
**Cih:** Kolana Hunerê
Rengên Mezopotamyayê
Navenda Hunerê ya Laleşê
**Saet:**10.00 -10.30
**Vekirin:** Atolyeya Berikan
**Cih:** Kolana Hunerê
**Saet:** 11.00-11.30
Bi wesayîtên Şaredariyê tura bajar
**Guzergah:** Ji ber Şaredariyê heta Cadeya Mezin



**Saet:** 12.00-13.00
**Panel**
**Mijar:** Li hemberî çanda desthilatdariya zilam, têkoşîna komunal a azadiya jinê
**Beşdervan:** Şaredara Dêrikê Çaglar Demîrel, Endama Koma Aştî û Çareseriya Demokratîk Elîf Uludag, Şaredara Bazîdê Dr. Canan Korkmaz
**Moderator:** Hulya Îpek
**Cih:** Parqa Yeşîltepe
**Saet:**14.00- 15.20
**Pêşandana Şanoyê**
**Lîstîk:** Evina Gul û Masî(Navenda Çanda Firat û Dîcleyê)
**Cîh:** Salona Şanoyê ya Çanda Laleşê
**Saet:** 16.00-17.30
**Konsera vekirinê:**
Koma Pel
Rojbîn
Koma Jinên Azad
Koma Laleş
**Cih:** Qada konserê ya li ber şaredariyê
**Saet:** 19.00-23.00
**01'ê Gulanê roja Şemiyê**
**Panel**
**Mijar:** Înşaya çanda neteweyî ya demokratîk a li hemberî komkujiya çandê
**Beşdarvan:** Şerefxan Cîzîrî - M.şerîf Gençdal
**Moderator:** Kemal Orgun
**Cîh:** Parka Yeşîltepe
**Saet:** 10.00-11.30
**Vekirina KURDÎ-DER'ê**
**Saet:** 12.00-12.45
**Bernameya Jinê**
XEMR-Î MOR (Projeya Jinên Mêrsînê)
**Cîh:** Navenda Çanda Laleşê
**Saet:** 13.00-14.30
**Vekirina otogara nû-Dîlana Rengîn (Govend)**
**Saet:** 15.30 -16.00
**Guhdarkirina helbestan**
**Helbestvan:** Mem Bawer-Lal Laleş-Arjen Arî
**Moderator:** Dundar Sansur
**Cih:** Parka Yeşîltepe
**Saet:** 16.30
**ŞANO**
"Fesadî"-Şanoya Reç-Navenda Çanda Laleşê
**Cîh:** Salona Navenda Çanda Laleşê
**Saet:** 17.00
Pêşandana fîlm (KAPLUMBAGALAR DA UÇAR)
**Cih:** Taxa Şehît Harun Boy-Karşiyaka
**Saet:** 20.00
**Filîm:** OZGURLUK RUZGARLARI
**Cih:** Taxa Cudî
**Saet:** 20.00
**OZGURLUGUN RENGÎ**
**Cih:** Taxa Cumhuriyet
**Saet:** 20.00
**Desteyek ji stranan:**
Koma Kulîlken Rojê (koroya zarokan)
Dengbejên Botan
**Saet:** 20.00
**2'ê Gulanê**
Vekirina standa xwarinên herêmî
**Cih:** Qada Mîhrîcanê
**Saet:** 12.00
**Konsera Fînalê:**
Agire Jiyan
Koma Sorxwîn
Cevdet Bagca
Koma Hîvron
Ferhat Tunç




# Sûsika Simo*



DILOVAN

**Dengbêj Dilovan çîroka Sûsika Simo bi rojnamegera kurd Şîlan Arasê re par ve kir. Sûsîka Simo yek ji dengbêjên jin ên kurdên Qafkasyayê ye. Çîroka wê kul û keserên gelê kurd vedibêje...**

Li nava kurdên ku li Yekitiya Sowyetan a kevin dijiyan, dengbêja jin a pêşîn, hunermenda jin a pêşîn, Sûsika Simo ye. Ji ber ku Sûsika Simo dengbêja me ya jin e, ku di sala 1946'an de, li ser navê gelê kurd cara pêşîn derkete ser dikê û kilamên bi kurdî got.

Heta wê hingê, tu dengbêjê/a kurdî li ba dewletê hatibû qebûlkirin tunebû û Sûsika Simo bû, ku cara pêşîn li ser dika dewletê, li Ermenistanê kilam gotine. Bi Kûlya Naftalyan re dixebitî û ne bi tenê li Ermenistanê, her wiha li Gurcistanê, ango li hemû welatên Sowyetê derketiye sehneyê û kilam gotine. Kûlya Naftalyan bi xwe haltêrvan bû, Sûsika Simo jî stranbêj bû. Kûlya Naftalyan wekî werzîşkar, Sûsika Simo jî wekî hunermendeke kurd derdikete ser dikê. Sûsika Simo hevsera Kûlya Naftalyanê ermenî bû. Li Ermenistanê, Sehneya Filarmoniyê hebû û ev sehne mezintirîn hol û cîgeh bû, ku danzdeh kêmneteweyan tê de çanda xwe, hunera xwe, pêşkên xwe pêşkêş dikirin. Bi tenê gelên kêmar nedihatine Filarmoniyê, her wiha ermenî, rûs û ji her gelekî mirov dihatin, ciyekî popûler bû, dihatin li pêşk û dengên ku dihatine pêşkêşkirin temaşe û guhdarî dikirin.

Bo nimûne, Belgiya Qadir, Eslîka Qadir (li Ermenistanê du Qadir hene, ya ku ez behsa wê dikim niha ne sax e) bi tenê di Radyoya Êrîvanê de kilam gotine û çûne di mala xwe de rûniştine. Lê Sûsika Simoyê di Radyoya Êrîvanê de kilam gotine, lê bi vê yekê jî nehatiye ser, ew bûye hunermenda jin a ku cara pêşîn derketiye ser sehneyê, cara pêşîn li hemû welatên Sovyetê geriyaye û qala hunera kurdan kiriye. Sûsika Simo aktrîsa sehneyê bû. Sûsika Simo bi kilama "Miho" ya wê bo cara pêşîn di Radyoya Êrîvanê de gotî hate naskirin û bi saya serê vê kilamê hate hezkirin.

Sûsika Simoyê ji yekî Ermenî hez kiribû, pê re mêr kiribû. Lê ji ber edetên civakê yên hişk î feodal civak pê ne xweş bû Sûsika Simoyê yekî ermenî kir, bi vê yekê qayîl nebû. Ji ber vê mêrkirina xwe, Sûsika Simo di nava kurdên Sovyetê de zêde nehate hezkirin, jiyaneke wê ya karesatî hebû. Ji ber ku kurdên Sovyetê, heke kesek ne ji ola wan, ne ji gelê wan bûya, pê re nedizewicîn, kî jî bi kesên wisa re bizewiciya, di qula çavên xwe de biçûk ditînin, ev zewaca wê nedipejirandin, bi gotina civakê, di çavê wan de ew jin "jina nepak" bû êdî. Ji ber vê yekê, nêzîktêdayînên erzan li dijî Sûsika Simoyê peyda bûn û heta bi ser de jî ji civaka xwe hate derkirin, çima ku Sûsika Simo beriya her tiştî jinek bû. Sûsika Simo yeke wisa bû, ku bi her awayî di ser hin aliyên kevneşopên tund ên gelê kurd, bi taybetî jî yên ola Êzdiyatiyê re, yên ku zehmet bû mirov di ser re qevaz bida, qevaz dida. Salên 1915'an wan çaxan, wê li Ermenistanê, li Gorepana Sor a ku mezintirîn û navdartirîn ciyê wê heyamê bû, konsêr didan. Her kesî bi rojan beriya konsêrê bilêtên xwe dikirrîn û ji bo ku bikevine hêwanê, beriya çalakiyê bi saetan dora xwe digirtin. Sûsika Simoyê dema ku konsêra xwe pêşkêş dikir, kincên kesk, sor û zer li xwe dikir û çefyeyek jî li dora serê xwe digerand. Zêdetir jî kilamên mîna

**"Dewra berê, dewra berê,**
*Belengaz bû, Lenîn rabû em*
*xelas bûn,*
*Navê Lenîn şêrîn şa bû,*
*Ilmê Marksîst bilind bû..."*
*Carinan bi Seyadê Şamê re*
*"Ax eman eman çi kulîlka dora*
*çeman*
*Were were lawiko qurban*
*Ax eman eman..."*

Pir caran digot û her kilama ku wê digot, bi kêf û eşqeke mezin dihate guhdarîkirin. Nexş û nemûrên hemû kilamên ku wê digot bi kurdî bûn. Lêbelê gelê me hunermendiya Wê napejirîne. Lê diviya gelê me Ew wekî hunermendekê bipejiranda, ji ber ku wê ji ber bêderfetiyên wê hingê nekariye kasêtan derxe, heke xwedîtî li wê û li kesên wekî wê neyê kirin, wê navê wê û dengê wê winda bibe here.

Jiyana Sûsika Simoyê pir dişibe jiyana Eyşe Şanê. Lêbelê Eyşe Şan li nava pergala Tirkiyeyê jiyaye, li wir, pergal çewisînertir, jinavbirtir û înkarkertir nêzîkî meseleyan dibe, Sûsika Simo lê li nava pergala Sosyalîst jiya, ji ber ku ji têgehên pergala Sosyalîst ên yeksanî û demokrasiyê mifa girt, ji aliyê pergalê ve zêde nehate çewisandin. Lêbelê civaka wê bi xwe ew çewisand û biçûk dît û wekî jineke kurd, ji bo ku bi hunermendiya xwe berdewam be, li hemberî gelek dijwariyan li ber xwe da. Lê girîngtirîn tişt ew bû, çewisandinan, pêkutiyan û dijwariyan nekirin, ku ew dev ji hunera xwe berde. Jineke çalak û bîrewer bû, ji civaka xwe ya kurd, ji kurdbûna xwe şerm nedikir, kilamên xwe hem bi kurdî, hem jî bi Ermenkî digot. Bi xwe çi qasî jî yeke piçekî qelew bû, li ser dikê çalak, zindî, bi lept û liv bû, ev yek hê jî tê bîra mirovan. Li ser sehneyê, hem kilam digot, hem jî govend digerand û dilîst. Sûsika Simo wekî yeke kurd, hunermenda dewletê ya Yekitiya Sovyetan a kevin a pêşîn û herî mezin e. Kûla Naftalyan û Sûsika Simo bi hev re derdiketine sehneyê. Wê hingê, kesên ku derdiketine ser sehneyê, bi navên xwe derdiketin, va ye, Sûsika Simo û mêrê wê jî bi wî awayî derdiketin ser sehneyan. Yek jî, wê hingê, kesên ku hunermendên dewletê nebûna, nikaribûn derketana ser sehneyê. Ji ber ku teknîk û derfetên wan ên derxistina kasêtan tunebû, wê hingê, tu kesî nekariye kasêtan derxe. Derxistina kasêtan encax di 1986/1990'î wan çaxan de dest pê kir, lewma jî, kasêtên Sûsika Simoyê tunene.

**** Ev nivîs ji hevpeyvîna nûçegihana ANF'ê, Şîlan Aras, di navbera 20-23'yê Tîrmeha 2006'an de, li devera Kelareşê, ji aliyê hêzên ewlekariyê yên Îranê ve hate kuştin hatiye girtin. Wergêra ji bo kurdî Kawa Nemir***

# Fîlmê 'Davîdê Tolhildan' li RSI2 TV'yê de

Fîlmê derhênerê kurd yê rojavayê Kurdistanê Mano Xelîl "Davîdê Tolhîldan" ku berî sê salan hatibû pêşandan careke din ket ser ekranan.

Li gor nûçeya Malpera Soparo, fîlma "Davîdê Tolhildan" roja 26 û 27'ê nîsanê li ser ekranên televîzyona Îtalî a Swisra "RSI2" hate weşandin"

Nûçe çîroka fîlm wiha dibêje fîlma 'Davîdê Tolhildan' çîroka xortê swîsreyî Davîd Rouiller, kurê Serokê Dadgeha Federal a Swîsreyê yê berê ye. Davîd dev ji jiyana xwe ya konfor a li Swîsreyê berda û ev bûye heşt sal, ku cihê xwe di nav refê gerîlayên kurd de dîtiye. Fîlm li ser jiyana vî xortê swîsreyî diaxive û ew bi xwe mînakeke ku bîner jiyana gerîla bi temamî nas bike".

Her wiha nûçe didomîne, "Dayika Davîd ji Swîsra berê xwe dide çiyayên Kurdistanê û ew jî dibe şahideke rastiya miletê kurd û mafê wî di jiyaneke azad û serbixwe de".

Der barê helwesta Tirkiyeyê de nûçe dibêje, "Tirkiye bi tundî ji destpêkê de şerê vî fîlmî dikir, piştî ku fîlm ket gelek sînemayan li Swîsreyê û li gelek mîhrîcanên navneteweyî. Li hin mîhrîcanên navneteweyî ev fîlm hate qedexekirin, ji ber ku rêjîma tirk mudaxele dikir, bi hiceta gotinên ev fîlmê "Terorîst"an e.

Nûçe aşkera dike, "Berî sê salan li Abu Dabi û li Singapor hate sekinandin. Tirk ku dîroka wan di nav xwîna ermen, yewnan û kurdan de maye, şerê hunera kurdî jî dike". Helbet rêjîma tirkan nikaribû fîlm ji ser ekranê rake!" **AMED *(aknews)***

# Klîba 'Rewend'ê li Heskîfê çêkir




Hunermend Aynur Dogan vê carê bi "Rewend"ê derket pêşberî hezkiriyên xwe. "Rewend" ku ji Sony Muzîk derketiye, tê de 12 stranên bi navê "Rewend", "Xivşê", "Xewn", "Koçerê", "Yaranmaz Aşik", "Dotmamê", "Improvisation Of Berivanê", "Delalê", "Xezalê", "Dawzer", "Gowende Dawzerê" cih digirin.

Aynur Dogan ji bo strana xwe ya bi navê Rewend li Heskîfê klîb çêkir.

Dogan bi vê yekê hem xwestiya balê bikişîne ser noqavkirina Heskîfê û hem jî xwestiye klîba strana xwe bi remzên dîrokî bixemilîne. **AMED**

www.arsivakurdi.org

Rupel 12+++++++++:Layout 1 28.04.2010 14:50 Page 1

ROJEV
29 Nîsan 2010 Hejmar: 30 Sal: 1

## Sedema çêkirina kevirên girover çi ye gelo?

Kevirên girover ên Kosta Rîka bi salan in dibe sedema spekulasyonan. Li gelek welatên Amerîkaya navîn kevirên gilover ên pir baş hatine çêkirin hene. Giraniya kevira herî mezin digehêje 16 tonî û gelek kevirên wisa hene. Heta niha zanyaran fêm nekirine ku ev kevir çawa hatine çêkirin û ji bo çi hatine çêkirin. Kevirên han herî zêde li Kosta Rîkayê hene û NY amadekariyan dike ku ji bo wê derê statuya Mîrata Çandî ya Cîhanê bide. Li gor îdiayan kevirên han wek nîşaneyên gerstêrkan hatine çêkirin. Îdiayeke din jî ev e ku têkiliya kevirên han bi UFO'yan re heye. Derbarê wan keviran de tu çavkaniyên nivîskî nîn e û ji ber vê yekê jî tu îdia nayên îspatkirin. NEW YORK



# Ji bo astengkirina lehiyan dixebitin

**Şaredariya Cizîrê, ji bo ku pirsgirêkên taxên di demsala zivistanê de di bin lehiya baranê de dimînin çareser bike, 'Projeya pêşîgirtina lehiyê' didomîne. Di çarçoveya projeyê de heta niha hezar û 600 metre qenal hate çêkirin**

Şaredariya Cizîrê, bi armanca çareserkirina pirsgirêkên ava baranê ku zivistanê li taxên Nûr, Yafes û Sûrê lehî çêdike xebatên "Projeya pêşîgirtina ava lehiyê" didomin. Di çarçoveya projeyê de heta niha hezar û 600 metre qenal hate çêkirin. Her wiha nêzî 15 pir li ser qenalan hatin çêkirin û dê li hemberî lehiyê 5 hezar dar bên çandin.

Şaredariya Cizîrê, bi mebesta pirsgirêkên taxên di zivistanê de di bin lehiya baranê de dimînin çareser bike, "Projeya pêşîgirtina lehiyê" didomîne. Di çarçoveya projeyê de ji bo firekirina Çemê Basîskê û di xebatên nûkirin û paqijkirina drenajê de qenalek hezar û 600 metre hate vekirin. Di xebatên li taxên Nûr û Cudiyê tên domandin de makîneyên kar tên bi kar anîn, şêniyên taxê jî alîkariyê didin yekîneyên xebatkarên şaredariyê. Cîgirê Şaredarê Cizîrê Mehmet Saçî têkildarî xebatên dimeşînin agahî dan û diyar kir ku ji bo pêşîgirtina lehî û islahkirinê Çemê Basîskê derfetên xwe seferber kirine. Saçî, anî ziman ku bi islaha çem û çandina daran hewl didin şebekeya ava baranê paqij bikin û şebekeyek nû ya ava baranê avabikin û pêşiyê li bûyerên lehiyên li Cîzîrê bigrin.

**Taxa Nûr tê nûkirin**

Saçî, derbarê xebatên şaredariyê de agahî dan û wiha got: "Li Taxa Cûdî xebatên vekirina qenala ji hezar metreyî pêk tê bi dawî bû. Girêdayî xebatan 2 pirayên ji 15 metreyî pêk tên hatin çêkirin û 5 hep pirên bilind ên çûn û hatine hatin çêkirin. Em dê di rojên li pêş de jî li Taxa Cudiyê pirayek din ava bikin. Li Taxa Nurê jî qenalên 2 metre û nîv kur û 6 metre dirêj hatin çêkirin. Di heman demê de xebata çêkirina qenalê ya 663 metreyî didomin. Li Taxa Nûrê di heman demê de 5 pira û 12 hep pirêyên çûn û hatinê dê bên çêkirin. Ji bo rê li pêşiya ava qirêj a li dora çeman bê girtin dê 300 borî bên raxistin. Di çarçoveya xebatên li taxê de di encama hevdîtina bi kesên oldar de mizgeftek li ser qenalê, 3 menfez, 4 cihên çûnhatinê, 2 mal û hewşên 7 malan jî hatin hilweşandin. Ji bo pêşwazîkirina zirarên derketin holê jî me bi welatiyan re hevdîtin çêkir. Malbatên hatin mexdûrkirin di çarçoveya derfetên şaredariyê me de dê zirarên wan bên dayîn. Piştî îro jî 5 malên li ser qenalê yên din jî dê bên hilweşandin."







Saçî, destnîşan kir ku di çarçoveya projeyê de 40 xebatkarên şaredariyê ji bo pêşîgirtina li afetên xwezayî û mudaxaleyên lezgînî bigrin hatine perwerdekirin û wiha axivî: "Yekîneya Mudexale û Pêşîgirtina li Bûyerên Xwezayî dê bê avakirin. Li Taxa Cudî ji ber bûyerên lehiyê 5 hezar dar dê bên çandin. Di heman demê de ji bo xwendekarên dibistana seretayî pirtûkên der barê lehiyê de agahiyê didin gel hatin belavkirin." ŞIRNEX

# Ji bo zarokan semînera tenduristiyê




Şaredariya navçeya Sûrê ya Amedê û Odeya Hekîmên Diranan a Amedê ji bo Meclîsa Zarokan semînera tenduristiya dev û diranan da.

Şaredariya navçeya Sûrê ya Amedê û Odeya Hekîmên Diranan a Amedê li Salona Meclîsê a Şaredariyê, der barê girîngiya tenduristiya dev û dirana de semînerek da zarokan. Cigirê Odeya Hekîmên Diranan Muzaffer Saruhan semîner da û bi taybetî li ser nexweşiyên diranan û xwe ji nexweşiya diranan parastinê de zarok perwerde kirin. Saruhan rêbazên xwe parastinê bi awayekî berfireh vegot. Saruhan der barê mijarê de axivî û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Zarokên ku diranên wan yê şîrmêjî neketibin divê teqez serî li hekîmekî bidin. Her wiha diranên zarokan jî dê baş dernekevin. Bîhna dev ji pidiyan diqewime. Her wiha xwarina ku di nava diranan de jî dimîne dibe sedema bîhnê. Ev bakterî asîtan çêdikin. Ew asît jî diranan xera dike û pidiyan perçe dike. Ji ber wê jî divê teqez beriya ku hun rakevin diranên xwe firçe bikin an jî gargara bikin. Di devê mirovan de diranekî riziyayê hebe ev dibe sedema nexweşiyan. Ji ber vê jî divê em girîngiyê bidin diranên xwe. Her wiha firçeyê jî dibê mirov baş bikarbîne û rêbazên firçekirinê jî baş bizanibin. Zêde bikaranîna macûnê zêde ne baş e. Mirov dikarin bi macûneke kêm ku kasî nokê be jî firçe bikin. Ev ji bo pajiyana diranê mirovan têr dike."

Saruhan û Cigirê Şaredariya Sûrê ya Amedê M. Alî Altunkaynak piştî semînerê firçe û macuna diranan li zarokan belav kir. AMED

# Vê paşverûtiyê biterikînin

Di navbera Sûriye û Tirkiyeyê de bi rakirina vîzeyan re rêbazeke pavşerû jî dest pê kir. Bi rakirina vîzeyan re kesên kal û yên dewlemend ji bo ku bizewicin ji Sûriyeyê dest bi anîna bûkên îthal kirin. Her wiha piştî ev hejmar zêde bûn, qelend jî zêde bû. Sîmsarên ku hewldan ji vê yekê para xwe bigirin, serî zewacê 1200 TL komîsyon digirin.

Piştî ku hejmara kesên ku di sînorên Hatay, Riha û Êlihê derbas dikin û dizewicin zêde bû li Sûriyê qelend bû 10 hezar TL. Bi taybetî jî Êlihê di 5 mehên dawî de 200 kesî ji Sûriyê bûk anîn. Piştî ku ji Sûriyê hejmara bûkan zêde bû sîmsar ketin dewreyê. Sîmsar ji kesên ku bûkê ji Sûriyeyê tînin 200 TL komîsyon digirin. Her wiha 8500 TL jî qelend dibin malbata keçikê.

Bavê 8 zarokan Mehmet Bayindir piştî ku hevsera wî dimire, ew jî ji Sûriyê dizewice. Bayindir diyar dike ku zewaca wî lê bi 10 hezar TL'yan mal bûye û wiha dibêje: "Li Êlihê gelek kes ji Sûriyeyê dizewicin. Min jî Sûriyeyê tercih kir. Ez teqawît bûme. Piştî ku hevsera min mir ez bi jina Sûriyeyê ya bi navê Nadîa Kahafat re zewicim.Min bi alîkariya sîmsaran ji wir bûk anî." Li aliyê din jî buroya Zewicandinê ya Şaredariya Êlihê di 5 mehên dawî de 200 mehrên bûkên ku ji Sûriyeyê hatibûn birîn. ÊLIH

# Dermanên bê reçete zêde tên bikaranîn

Li ser bikaranîna dermanên bê reçete di navbera 16 welatî de li ser 12 hezar û 500 kesan lêkolînek hate kirin û di encama lêkolînê de derket holê ku li Tirkiyeyê ji sedî 48 dermanên bê reçete tên bikaranîn.

Lêkolîn li Avustralya, Belçîka, Şîlî, Fransa, Hong Kong, Macarîstan, Endonezya, Kore, Hollanda, Sirbîstan, Ispanya, Tayvan, welatên ereb, Îngîltere, Amerîka û Tirkiyeyê hate kirin. Li Tirkiyeyê li bajarên wekî Stenbol, Enqere û Îzmîrê lêkolîn pêk hat. Di navbera temenê 18- 54'an de pêk hat. Bi giştî 515 jin û mêr tevlî vê lêkolînê bûn.

Li gorî encamên lêkolînê derket holê ku di 6 mehên dawî de li Tirkiyeyê rêjeya bikaranîna dermanên bê reçete ji sedî 48 in û her wiha dermanê bê reçete yê ku herî zêde hatiye bikaranîn jî ji sedî 35 in ku ew dermanên êşbirînê ne.

Dermanên ji bo kuxik û şewbê, ligel vê dermanên ku di warê vîtamînan de dewlemendin ji aliyê gel ve zêde tê bikaranîn.

Kesên ku tevlî lêkolînê bûn ji sedî 72'an diyar kirin ku herî zêde dermanên ji bo şewbê û kuxikê dkirin. Ji sedî 62'an diyar kirin ku her tim dermanên êşbirînê ligel xwe digerînin. ENQERE

# Li Bismil birûskê pez kuştin

Li navçeya Bismila Amedê di encama barîna baranê ya zêde de birûskê li nava pez xist û di encama vê de 9 pez telef bûn. Sewalkarê bi navê Ahmet Çiftçi dema ku ligel Çemê Dîcleyê pezê xwe diçêrand, baranê dest pê kir û bi dest pê kirina baranê re jî birûskê li nava pez xist, Di encama bûyerê de 9 pez telef bûn. AMED

